KAMRAN BEDIR-XAN

# RÊZANA ZMANÊ KURDÎ

PARIS

1 9 7 1

L.P.-K.L. 232.(2)

Kamran Bedir - Xan

# Rêzana Zmanê Kurdî

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

Parîs I97I

## Zmanê Me

Zmanê me zmanekî Hind û Ewrupayî ye . Kaniya wî a kevn zmanê Med û Avestayî ye . Herwekî nas e , zmanên Hind û Ewrupayî kom kom in ; mîna koma latînî , koma slavî , koma germanî , koma îranî .

Zmanên frensizî , tâlyanî , spanî , portekîzî ji koma latînî ne .

Zmanên rûsî , polonî , bulgarî , sirbî û h.d. ji koma slavî ne .

Zmanên elemanî , ingilîzî , svêçî , holendî û h.d. ji koma germanî ne .

Heçî zmanên farisî , kurdî , efganî , bilûcî , piştu ji koma îranî ne .

Ji xwe gava mirov bala xwe dide çend pirsên bingehîn yên zmanê me , zu tê seh kirin ko zmanê kurdî ji zmanên erebî û tirkî dûr e .

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Bi kurdî : | Stêr | Bra,brader | dot | kurt |
| Bi erebî : | necim | ax | bint | qesîr |
| Bi tirkî : | yildiz | kardeş | kiz | qisa |
| Bi elemanî : | Stern | Bruder | Tochter | kurz |
| Bi ingilîzî : | Star | Brother | Daughter | Short |
| Bi kurdî | lêv | dran | pol | ejnû |
| Bi frensizî : | levre | dent | Epaul | Genou |
| Bi tirkî : | dudak | diş | omuz | dîz |

û herwekî din .

Di xwendegahên bilind û di hin zanîngehan de dersa zman , wîje ango edebiyat û şarvanî ango medeniyeta kurdî heye wek : Zanîngeha Parîsê , Moskovayê , Erêwanê , Tehranê , Bagdadê , Emerîkayê û Berlînê .

# Rêzana Zmanê Kurdî

1 - Rêzana zmanekî rêzikên ango qeydeyên rastaxaftin, rastxwendin û rastnivîsandina zmanekî dide zanîn.

2 - Rêzana zmanê kurdî ji me re rêzikên zmanê me dide zanîn û me fêrî rastaxaftin, rastnivîsandin û rast-xwendina zmanê me dike.

3 - Bitenê em mirov, jin û mêr, dikarin raman û dilxwazên xwe, fikir û xwestekên xwe bi zmên bidin zanîn.

4 - Em raman ango fikir û daxwazên xwe an bi zmanê axaftinê an bi zmanê nivîsandinê didin zanîn.

5 - Zmanê axaftinê bi dengan çêdibe, heçî zmanê nivîsandinê bi tîpan ango bi herfan pêk tê.

6 - Her tîp ango her herf, ji me re, dengekî nîşan dide. Deng an tîp digehin hev û ji vê pêkhatinê, gihanhevê bêje ango kelime derdikeve.

7 - Bêje ango kelime pirseke xweymana ye wek : çav, , enî, rez, dest, çiya, robar, pez, rovî, mirov, piling, dar û herwekî din. ( bi kurtî h.d. ).

8 - Hevok ango cumle. Hevok çend bêje ne ko ji me re tiştê ko çêbûye, tştê ko çêdibe an dê çêbibe, fikir an daxwazekê dide zanîn wek : Îro dinya sar e. Brayê min çû gundê xwe. Kurdistan welatê min e. Xebat şêr e, dest avêt ê dibe rovî. Çiya nî ne ko rê pê ne keve. Ko şev reş bû, tu reştir be. Tiştê ko dest dike, dê û bav na ke. Dilê tirsok sînga gewr na bîne. Bi xweziyan dest na keve baqa keziyan. Şêr şêr e çi jin e, çi mêr e. Dinya gulek e, bihn bike û bide hevalê xwe. Heta mirinê, çav li kirinê. An mêrê baş be, an bivir û das be, an bimir ji xwe xelas be. Serê bê teq û req ji xwe kundir e. Mêran mêr dikuştin, Ebo ûr diguştin. Ga dimire jê çerm dimîne, mirov dimire jê nav dimîne. Helaw, helaw dev şîrîn na be.

9 - Elfabeya kurdî ji sih û yek tîpan hevedudanî ye :

a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z .

IO - Tîp du texlît in : hûr û gir . Ji tîpên hûr re hûrek û ji tîpên gir re girdek dibêjin .

Di navbira tîpên çapê ango kitêb û roj naman û tîpên destnivîsandinê jî hinik cihê bûn ango ferq heye . Tîpên jorîn hûrek in , heçî tîpên jêrîn girdek in :

A B C Ç D E Ê F G H I Î J K L M N O P Q R S Ş T U Û V W X Y Z .

11 - Dengdêr û dengdar vê tî

Tîp ji aliyê dengdariyê/du texlît in dengdêr û dengdar .

Dengdêr ev tîp e ko dixwedeng e û dengê wê bi serê xwe derdikeve û dengê dengdaran derdixîne , didêre .

Dengdar ev tîp e ko dixwedeng e lêbelê dengê wê bi serê xwe û bê arîkariya dengdêrê dernakeve .

Di zmanê kurdî de heşt dengdêr hene :

a e ê i î o u û

I2 - Dengdêr jî du texlît in : kin û drêj .

Dengdêren kin : e i u ne .

Dengdêrên drêj : a ê î o û ne .

Ango sê dengdêrên kurt û pênc dengdêrên drêj hene .

Hînker li ser dengdêrên kurt : ez , ew , em , din , gir , kur , gur , ker , şer , ber , der , deng , reng û h.d.

Hînker li ser dengdêrên drêj : av , nav , bav , caw , kar , ava , agir , kûr , dûr , bûn , dêr , dîn ,stêr , sto , stûn , stran , çar , kar , xanî , germiyan , zozan , mêr û H. d.

13 - Dengdar .

Di elfabeya kurdî de 23 dengdar hene :

b c ç d f g h j k l m n p q r s ş t v w x y z

[illegible] li [illegible] :

[illegible] , [illegible] , [illegible] , [illegible] , helê , [illegible] , [illegible] , [illegible] .

[illegible] , [illegible] , [illegible] , cohnî , [illegible] , [illegible] [illegible] .

Hînker li ser dengdaran :

b bav , ber , bûk , bra , beran , belê , bûm ,
bend , bendewar , benik , berdan , berdan û h.d.

c car , cem , ciwan , cendek , ciwanî , cirîd,
caw , comerd , comerdî , ciwanmêr , cehnî û h.d.

ç çav , çerm , çire , çek , çarde , çem , çinar ,
çilo , çawan , çenebaz , çavik , çak , çêtir û h.d.

d difn , drêj , du , derzî , drûtin , deng , derew ,
derewîn , dîn , din , donzde , deh , dergevan ,
derî , derge , dem , danîn , derketin û h.d.

f fanûs , firotin , filan , find , ferxik , fal ,
fincan , Ferzende , Ferxo , Faxir , fidakar û h.d.

g ga , gamêş , gewr , genî , gir , giremêr ,
gerden , guneh , gunehkar , gund , gundî
genim , gêzer , govend , ger , girav û h.d.

h heval , hewa , hirmî , hingê , hinar , hew ,
heşt , hejde , hatin , hejmartin , hon , her û h.d.

j jar , jor , jêr , jorîn , jêrîn , jehr , jin ,
jijû , jinebî , jeng û h.d.

K ker , kar , kadîn , keyf , kelem , kanî ,kin ,
kendal , kenar , kerem , kevn , kevnare û h.d.

l lam , lo , lê , lewra , lewma , lome , lal ,
lek , lolo , lêlê , legen û h.d.

m mam , mêr , mal , mer , mûm , mak , mî û h.d.

n nav , name , neh , nan , nik , nozde ,
nexwe , narîn , nazenîn , nemerd , navik û h.d.

p par , pêrar , pê , perde , pising , piştik ,
pehîz , pehîzok , pronav , pehn , pehnî û h.d.

q qelem , qehwe , qebale , qîr , qenc û h.d.

r ra , rê , rêkirin , rabûn , rûniştin , reng ,
rih , rêvin , rengdêr , rengîn û h.d.

s ser , seyran , serma , sor , sing , sîng ,
secde , sibe , ser seran , li ser çavan û h.d.

ş şev , şor , şîn , şûr , şer , şewat , şîr û h.d.
t tarî , tifing , ter , tal , tim , tifaq , teng , titin , tengasî , terahî , tirî , tehl û h.d.
v vêran , vebûn , vekirin , vedan , veşartin , veniştin , vexwarin , vekuştin , veweşandin û H D
w were , wêran , welê , winda , wisa û h.d.
x xanî , xem , xela , xew , xwîn , xwarin û h.d.
Y yar , yekîtî , yekcar , yewnanî , yek , yek - bûn û h .d.
z zaro , zer , zor , ziwa , zilm , zalim , Zerdeşt , zirtole , ziremêr , zevî , zana , zanîngeh , zer , zava , zencîr , zina , zêr , zîv , zîvker , zêrînger , zerdelû û h.d.

Herwekî me li jor goti bû dengên dengdaran [illegible] bê arîkariya dengdêran dernakevin û em ni karin bê arîkariya wan bêjeyekê bibêjin an binivîsin . Ji xwe hînkerênjorîn bi awayekê ronak [illegible] ev rastî pêş me kir .

14 - Pevdeng .

Pevdeng bi yekbûna du dengan , du tîpan çêdibe û dengên wan bi arîkariya dengdêrekê derdikeve . Di zmanê me de pevdengek bitenê heye :

xw

Xwedê , xweh , xwîşk , xwê , xwesû , xwezûr , xwarin , vexwarin , xwendin û h. d .

I5 - Bêje an pirs .

Me goti bû ko bêje pirseke xwey mana ye her wekî Derî , mal , heval , bra , stêr , sto , stûn , stran , zman , dar , Tacîn , ga , hesp û h.d.

16 - Bêje ango pirs ji kîtan hevedudanî ye . Kîte ango hece pariyek ji bêjeyekê ye ko bi derbekê de ji devê me derdikeve . Herwekî di bêjeya welat de du kît hene [illegible] we lat

Ji bona bilêvkirina vê bêjeyê divê em devê xwe , zman û lêvên xwe , du caran bilivînin , carekê ji bona derêxistina dengên we û careke din ji bona derêxistina dengên lat . Gelo di bêjeya , di pirsa welat de çend deng ango tîp hene ?

Em ê wan bihejmêrin 1 w , 2 e , sisê l , 4 a , 5 t .

Ji vê hejmartinê hate zanîn ko di bêjeya welat de pênc deng û pênc tîp hene .

17 - Yekîte , pirkîte .

Bêjeyin hene ko ji kîteyekê pêk ‿ ntên mîna :

nav , av , bav , dê , rê , mam , xal , kar , bar , guh , dran , stêr , sto , stûn , lêv , kesk , bra , zman , şev , roj , meh , ax , kar , ker , gur , guh û h.d.

Ev bêje hemî yekîte ne .

Ji aliyê din bêjeyin hene ko ji du , ji sê , ji çar û hêj bêtir kîteyan lêk tên , ji wan bêjeyan re pirkîte nav lê dikin .

Bêjeyên dukîte : ava , kanî , enî , rabûn , kirin , danîn , gotin , xwarin , destmal , kiras û h.d.

Bêjeyên sêkîte : vexwarin , vexwendin , nivîsîn , deranîn , hilanîn , rêkirin , reşandin , vemirîn û h.d.

Bêjeyên çarkîte : şemirandin , vemirandin , nivîsandin , ecibandin , terikandin , ceribandin û h.d.

I8 - Ra [illegible] .

Herwekî dar çiklan dide wiha jî hin bêje bêjeyine din didin zayîn .

Ji bêjeya mader re ra tê gotin herwekî rayê bêjeyên mêranî , mêrxasî , mêrkujî mêr e . Rayê bêjeyên destik , destmêj , destkêş , destar , destî , dest e .

I9 - Guhêrker .

Guhêrker ev parek in ko tên danîn pêş an paş bêjeya hîmî (xwerû ) mana vê bêjeyê diguherînin û bjeyine nû didin zayîn ango bêjeyine hevedudanî .

20 - Guhêrker pir texlît in wek pêşdanî û paş danî .

rê , ra , ve , hil , der , da , vê û h.d. Em bi arîkariya pêşdaniyên jorîn dikarin bêjeyine , raderine nû çêkin herwekî :

kirin , vekirin , rêkirin , rakirin , vekirin , derkirin , hilkirin, dakirin û h.d.

bûn , vebûn , rabûn , hebûn û h. d.

ketin , daketin , raketin , veketin , vêketin û h.d.

dan , dadan , badan , derdan , rêdan , hildan , vedan û h.d.

şandin , reşandin , kişandin û h.d.

21 - Guhêrkerên din yên paşdanî .

Guhêrkerin din yên bingehîn ko bêjeyine nû didin çêkirin ev in : istan , geh , gah , dar , van , bar , ban , war , iyan , mende , tî , kar , ker , tir , anî , ahî , î , mend , ber û h.d.

istan , kurdistan , gulistan , goristan , daristan û h.d.

geh , seyrangeh , rûniştgeh , eskergeh , civangeh û h.d.

gah , xwendegah û h.d.

dar , guhdar , dersdar , berxurdar , sermayedar û h.d.

van , nêçîrvan , masîvan , dergevan , notirvan , rojnamevan , nêrevan , nivîsevan û h.d.

bar , guhêrbar , xwarinbar , vexwarbar , kirêbar û h.d.

ban , nigehban û h.d.

war , bextewar û h.d.

iyan , sermiyan , germiyan û h.d.

mende , şermende û h.d.

tî , bratî , hevalîtî , tihnîtî û h.d.

kar , xwendekar , hevalkar û h.d.

ker , karker , şerker , pirsker , kêmker û h.d.

tir , çaktir , pehntir , zortir û h. d.

ahî , mezinahî , avahî piçûkahî û h. D

anî , kêmanî û h. d.

î , kurdî , diyarbekrî , sineyî , ciwanî û h. d .

mend , eqilmend , dewlemend , hawermend , derdimend ; û h . d.

ber , rehber û h.d.

Zêr , zêrîn , zîv , zîvîn jî bi arîkariya paş-
daniyên în hatine çêkirin .

Guhêrkerên din yên ko despêka bêjeyê tên danîn mîna
ber , berşîr , ser serdest û h . d .

22 - ji xwe bi arîkariya du navan , du rengdêran ,
nav û rengdêrekê , nav û lêkerekê , bi du lêkeran ,
bi hoker û navekî jî bêjeyine nû tên çêkirin .

a - bi arîkariya du navan : destbra , destar , xwarinxane ,
dersxane , perçerojname , destmal , rojname , sew-
gur û h.d.

b - bi arîkariya du rengdêran : sorespî , keskesor .

c - bi arîkariya nav û rengdêrekê : sorgul , dilnerm ,
şîrgerm , dilhişk , destvekirî , destvşla ,
destvekirî , destgirtî , desteng , bihinfireh ,
serhişk , çavsor , çavbirçî , çavbel , çavteng
mêrxas û h. d .

ç - bi arîkariya nav û lêkerekê : danpey û h.d.

d - bi arîkariya du lêkeran : berdeborîn û h.d .

e - bi arîkariya hoker û lêkerekê : pêşmêr , paş -
mêr û h.d.

23 - Piçûker .

Hin paşdanî mana ango rêzaya bêjeyekê kêmtir , piçûktir
dikin wek : ek , ok , kok , ole , kole .
û h. d.

Keç , keçik an keçkok , axa , axayok , mîr , mîrek ,
met , metik , dê , dadik , xweş , xweşik , piçûk ,
piçkole , reşik , reşkole , xwîşk , xwîşkok , jin ,
jinik , xwîşk , xwîşkok , zman , zmanok , dev , devik
û h . d .

Nîşank .Iroro , di nav bira keç an keçik û jin an jinik
ferq ango cihêbûnê ne maye .

24 - Bêtirker an pêşhevanî .

Paşdaniya bêtirker an pêşhevanî tir e .
Mezin , mezintir , xweştir , çak , çaktir , mêr , mêrtir , comerd , comerdtir , ciwan , ciwantir , zirav , ziravtir , stûr , stûrtir û h . d .
Hînker : Hespê te ji hespê min ciwantir e . Mehîna wê ji ya min bezatir e . Bavê min ji mamê min pîr - tir e .

25 - Berhevanî .

Berhevanî tê çêkirin bi danîna pronavekî hebûnê yê , ya an yên berî bêjeyekê ya ko bêtirker standiye wek : Yê mezintir Xwedê ye . Yê mêrtir Tacîn e . Frensiz dewlemend in lê yên dewlemendtir emerîkanî ne .
Nîşank . Ji aliyê din bi danîna dawiya bêjeyê pareka tirîn berhevaniyek tê çêkirin wek :
mezintirîn , çaktirîn , xweştirîn , spehîtirîn û h. d.
Hînker . mezin mezintir , yê , ya , yên mezintir , mezintirîn .
Xweş , xweştir , yê , ya , yên xweştir , xweştirîn .

26 - Eyleta navan .

Eyleta navan tevayiya bêje ne yên ko ji rayekî ne wek :
Dest , destî , destik , destar , dezgeh , destav , destnmêj , destvala , destgirtî , destvekirî , dest - teng , destek , destbeser û h. d .
Germ , germî , germiyan , germav , germo û h . d.
Rê , rêbir , rehber , rêbiwar , rêbiwarî , rêwingî û h. d.

27 - Perçeyên axaftinê .

Perçeyên axaftinê tevayiya bêje ne ko di axaftin û nivîsandinê de bikêrî me tên . Ev deh heb in . Pêncên wan guhêrbar in ango di axaftin û nivîsandinê de car car û li gora qeydeyan , şiklên xwe diguherînin têne tewandin . Pênc perçeyên din ên mayîn di nav axaftin û

û nivîsandinê de , şiklên xwe na guherînin , weke xwe dimînin ango ev pêncên mayîn bêjeyine ne guhêrbar in .

Bêjeyên guherbar :

Nav , pronav , veqetandek , lêker û rengdêr ji rengdêra çilobûn û çawabûnê pê ve .

28 - Nav . u

Nav weke : Sînem , hesp , mirov , xanî , Hewlêr , bra , pismam , enî , çav , rê , mizgeft , ronahî û h.d.

29 -Pronav.

Pronav : Pronav ev parek in ko cihê navî digirin wek : Ez , tu , ew , em , hon , ew , min , te , wî , wê , me , we wan û h. d.

Hînker . Brayê te hat ? No , ew îro na yê . Ferzende çi got , Wî tiştek ne got . Hon îro diçin xwendegahê ? No , em îro na çin xwendegahê , ew îro girtiye . Tacîn tu î ? No , ez ne Tacîn im , ez pismamê wî me . Elo , çi dike ? Ew dersa xwe dixwîne .

30 - Veqetandek :

Veqetandek tê dayîn dawiya bêjeyê . Ew sisê ne : ê jibona nêr , yekejmar ; a ji bona mê , yekejmar û ên , navên nêr û mê gelejmar : bavê min , xwîşka te , hevalên me, keçên wî , hespên cîra nê me . Rayên darê ; bajarên Kurdistanê . Zaroyên xwendegahê .

31 - Lêker .

Lêker ev bêje ye ko hebûnekê , kirinekê , qewimandinekê , raman ango fikrekê û h. d . şanî me dide . Bitenê bi arîkariya lêkerekê em dikarin baxêvin wek :

Min sêvek xwar . Temo hevalê xwe dît . Ez ji Rohayê têm . Em diçin Kurdistanê . Ez radibim , ew rûdine . Hevalê min hat . Ez ji gund vegeriyam .

Bê lêker ê hevokên jorîn bê fesal in :

Min sêvek.Temo hevalê xwe . Ez ji Rohayê . Ez Kurdistanê . û h. d.

32 - Rengdêr .

Ji rengdêra çilobûn û çawabûnê pê ve , rengdêr hemî bêjeyine guhêrbar in wek : rengdêrên destdaniyê , rengdêrên pêşker , rengdêrên nebinavkirî û h.d.

33 - Bêjeyên neguhêrbar .

Bêjeyên neguhêrbar jî pênc in : rengdêra çilobûn û çawabûnê , hoker , daçek , gihanek û banişan .

34 - Rengdêra çilobûn û çawabûnê .

Rengdêra çilobûn û çawabûnê ev rengdêr in ko çilobûn û çawabûná navî pêş me dikin , diwesifînin . wek : spehî , kirêt , xweş , drêj , kurt , sar , germ , hindik , pir , fireh , teng , tarî û h. d.

35 - Hoker .

Hoker bêjeyeke ne guhêrbar e ya ko bikêrî edilandina mana lêkerekê , rengdêrekê an hokereke din tê .
Zû , gelek û h. d.
Hînker : Mirovên qenc zû dimirin . Temo gelek şehreza ye .

Herwekî tê dîtin : Mirovên qenc zû dimirin , zû hokerek e , mana mirinê edilan . Temo gelek şehreza ye gelek mana rengdêra şehreza ediland .

36 - Daçek .

Daçek bêjeyeke neguhêrbar e . Ew girêdaniya du bêjeyan û hevebûna wan dide zanîn wek : Ew ji pêncwînê tê .
Ez li Kurdistanê mezin bûm .

Ji , li , der û h. d. daçek in .

37 - Gihanek .

Gihnanek bêjeyeke neguhêrbar e . Ew bikêrî girêdaniya du perçe hevokê an du gotin an bêjeyê tê wek : Ez û tu .
Gava ez li Silêmaniyê bûm . Karê mêran serfirazî an mirin e .

Di van hevokan de û , gava , an gihanek in .

38 - Baneşan .

Baneşan bêjeyine ne guhêrbar in û dilxweşiyekê , eci - bandinekê , bankirinekê , kovan û keserekê , nişkebûnekê tîne pêş çavan herwekî :
Lê lê , lo lo , hey lê , hey , hey lo , ox , gelî , way , ya bo , ya dê , ax li min ezo , ax li min ezê û h. d.

39 - Hûrek û girdek .

Tîp, ji awayê nivîsandinê ve,du texlît in : hûrek û girdek . Adetî em bi tîpên hûrek dinivîsin , lê cihin hene ko me divê tîpên destpêka bêjeyan bi girdekan bini - vîsînin .

Bi tîpên girdek tên nivîsandin :

a - destpêka hevokekê wek : Îro dinya sar e .
Ez diçim mala xwe . Hevalê min Temo diçe xwendê - gaha destpêkî , heçî ez , îsal, herim xwendegaha navîn . Brayê Egîd xwendegaha bilind qedand .
Di bajarê me de zanîngeh nî ne .

b - Tîpa pêşîn ya serenavekî wek : Temir. Ferzende , Canpolad . Barzanî . Mistefa . Dilêr . Serdar û h.d.
Min Temo dît . Ez , duhî , li sûkê rastî hevalê xwe Canpold hatim .

C- Tîpa pêşîn ya şewaneyekê ango şihrekê :

Îşev şev e , şev bi şev e ,
Heyiv derket stêra xwe ve .

---

Ne botî me , ne xerzî me , xulamê axa Kurdistan ,
Ne mîr im ez , ne axa me , peyayê dewleta kurdan .

---

Ez pîlewer im , ne gewherî me
Xodreste me ez , ne perwerî me .
Ehmedê Xanî .

Ger bibêjim , dê bibêjî ew Cegerxwîn kafir e ,
No , di bextê te û Xwedê da , dilbi pêt û agir e .
Cegerxwîn .

d - Piştî du rawestan .

Piştî du rawestan gava mirov gotina kesekî tîne bîr .
Temo ji deya xwe re dinivîsand : Dijmin bê eman e , lê em pêdidin erdê .

40 - Hevdeng .

Hevdeng ev bêje ne ko bilêvkirina wan , awayê nivîsandina wan , her çend jî , mîna hev in rê - zaya wan , ango mana wan cihê ye wek : dar , ber , kar , mal û H .d . wek : mala min ango xaniyê min ; malê min ango pere û milkên min ; dara mezin ango dara ko ne hate birîn , darê derî ango darê ko hatiye birîn , karê min ango xebata min , kara min ango qezenca min û h.d.

41 - Rêzahev ango hevmana .

rêzahev ev bêje ne ko rêzayên wan , ji nîzîkahî ve , mîna hev in wek : Qenc , baş , rind , xas , qeşeng û h.d. Zû , lez . Bodile , ehmeq . nêrîn , fet kirin , mêze kirin . Axaftin , peyivîn , qise kirin , xeber dan , xalxal kirin û h.d. Welê , holê , werge , wisa , wiha û h.d.

42 - Dijraber .

Dijraber ev bêje ne ko rêzaya wan , ango mana wan dij hev in mîna : ger ; aşîtî ; hevalîtî , dijminîtî ; spehîtî , kirêtî ; kurt , drêj , destvekirî , destgirtî , bihnfireh , bihnteng , kurt , drêj û h. d.

42 - Deh birên axaftinê .

Em ê careke din bala xwe bidin deh birên ango parên axaf - tinê . Herwekî li jor hati bû gotin parên axaftinê deh in . Pênc hebên wan guhêrbar û penc heben din neguhêrbar in .
Bjeyên guherbar ev in :
Navdêr ango nav , pronav , veqetandek , lêker ango fiil û rengdêr ji regdêra çilbûn û çawabûnê pê ve .

Bêjeyên neguhêrbar .

Bêjeyên neguhêrbar ev in : Rengdêra çilobûn û çawabûnê , hoker , daçek , gihanek û baneşan .

43 - Nav .

Bêjeyen ko bikêrî binavkirina kesan , heywanan û tiştan û kirin û qewimandinan tên,nav in wek : mirov , jin , zaro , hesp , pilig , stêr , çiya , çem , rob ar, çav , enî , Kurdistan , welat , gul , Temo , îran , tifing , xencer û h. d.

44 - Serenev û hevenav .

Nav du texlît in : Serenav û hevenav . Serenav ev nav in ko bi awakî xas li mirovekî , li heywanekê an li tiştekî tê , ji wan re hate dayîn wek : Elo , Ferzende , Temo , Sînem Dilnaz , Kurdistan , Zozek , Endrîn , Dicle , Zab û h.d. Hevenav ev nav e ko li hemî kes , heywan an tiştan yên ko ji cinsekî ne tê

wek , mirov , se , hesp , xanî , bexçe gosçt , nan , dest , çav , ling , mase û h.d.

45 - Navên kombêj .

Navên kombêj ev nav in ko şiklên wan yekejmar e lê komek e mirovan , heywanan an tiştan şanî me dikin wek : Lek , sef , kerî , ref , selef ( selefê siwaran ) .

46 - Navên nêrbaran .

Navên nêrbaran ev nav in ko hatin/dayîn mirov( jin û mêr ), heywan û tiştan û em dikarin wan bi çavên xwe bibînin , destê xwe bidin wan û wan bihesin wek : Mirov , av , xanî , dikan , mijûlgeh û h. d.

## 47 - Navên nenêrbaran .

Navên nenêrbaran ev nav in ko em gewherê wan , canê wan dihesin lê em nikarin bi çavên xwe bibînin û bi-destdanê heyîna wan bizanin wek : Hevalîtî , dilovanî , mihrivanî , mêrxasî , qencî û h.d.

## 48 - Navên hevedudanî .

Navên hevedudanî ev nav in ko ji du an bêtir parek an bê-jeyan hevedudanî ne wek : serbajar , sergovend , dil - nermî û h. d.

Herwekî me berî jî dîti bû zmanê me de çêkirina bêjeyên nû gelek hêsanî ye wek :Dan , berdan , dadan,derdan , badan , serdan ,, guh dan , av dan , heq dan , baz dan , xeber dan , xweh dan , lê dan , dan rê , dan pey ,dan der , dan ser , berhev dan , dan hev , rê dan , dest dan , bala xwe dan , xwe tev dan , bihn di xwe dan , dil li hev dan û h.d.

## 49 - Zayend .

di zmanê me de du zayend hene : Zayenda nêr û zayenda mê : Navên mirovan , heywanan û heyînên nêr ji zayenda nêr in wek : Bav , pismam , xal , xwezûr , zava , Temo , Êlo û h.d. Heçî navên jin û keçan mîna : Dê , dotmam , xaltik , bûk , xwesû , xwîşk = xweh , dêza ji zayenda mê ne . Hin nav li nêr û mê tên wek : heval , cîran , dersdar û h . d . : hevalê min , hevala min ; cîranê min , cîrana min , dersdarê min , dersdara min û h. d.

Heçî navên heywanan ; ji bona hin heywanan,li gora zayenda wan , navine cihê hene wek : Nêrî , bizin ; hesp mehîn , beran , mî ; boxe , çêlek , gur , dêlegur , sê , dêlese ; ker , maker û h.d.
Ji aliyê din , ji bona hin heywanan navine sersekinî hene bê guhdana zayenda wan wek : hirç , kevok , [illegible] , [illegible]

ji zayenda mê ne , bervajî rovî , şêr , piling ji zayenda nêr in .

Gava mirov dixwaze zayenda heywanekî bi esehî bide zanîn dawiya navî veqetandekên ê ji bona nêr û a ji bona mê datîne wek : kevroşkê nêr , kevroşka mê ; hirçê nêr , hirça mê ; kew nêr e , mêkew mê ye . Ji bona kevê nêr nêrekew jî tê gotin .

50 - Navên tiştan .

Heçî navên tiştan , her çend jî , ew bê zayend in , ji wan re zayendek hatiye danîn wek : mal mê ye lê xanî nêr e . Navên bajaran hemî mê ne û h. d.

51 - Jmarnav .

Di zmanê me de du jmarnav hene : Yekejmar , gelejmar . Navek yekejmar e gava ew mirovekî , jinekê , heywanekî an tiştekî şanî me dike wek : Mirovek , jinek , hespek , mehînek , xaniyek û h. d.

[illegible] yek [illegible] iya [illegible] rovek , [illegible] k , [illegible] , [illegible] avek [illegible]

Gelejmariya navan , di zmanê kurdî de bi arîkariya veqetandek tewank , daçek û lêkeran têne çêkirin .

52 - Veqetandek .

Me di rûpelên berî de qala veqetandekê kiri bû , niho em ê bi kitkitên wê mijûl bibin .

Gava navek têrkerek distîne

, bi vê ne vê veqetandekek tê dayîn dawiya vî navî . Têrkerên ko navek distîne çar texlît in : navek an du ,sê navan , rengdêreke çilobûn û çawabûnê , rengdêreke destdaniyê û dawî pronaveke pêhatî .

a - Mamê Sînemê . Hespê Tacînî . Dengên hevalan û h. d.
b - Gula spehî . Xortê hêja . Mamosteyê zana . Mehîna reş û h.d

C ɔ- Brayê min . Hevalê te Jina wî . Zaroyên wan ,

hevalên me û h .d.

ç - Mirovê ko hat . Mehîna ko min dît û h . d .

Nîşank . Heke nav bi dengdêrekê diqede seba ahengdariyê

...t^nav berî veqetandekê - y yek distîne wek :

Brayê te . Çiyayê bilind . Rûyê hevalê te . Reya

drêj .

Nîşank . Heke nav bi dengd êrên î an e diqede û veqe-

tandekekê distîne î û ê bilindekên xwe davêjin wek :

Xanî lê xaniyê min. Rê lê reya min . Dê lê deya te .Pê lê

peyê min .

Nîşank . Li hin navçeyên Kurdistanê cihê deya min diya min ,

cihê peyê min , piyê min dibêjin .

Nîşank . Gava nav bi yekî bê tir nav an rêgdayan tê berçav

kirin dîsa veqetandek daxwaza me digihîne cih wek :

Brayê min ê mezin . Mala te ya nû .. Kurê Tacînê dewlemend .

Kurê comerd yê Tacînê dewlemend .

Di zmanê kurdî de , der ve babetê , reyekein jî heye ev jî

xebitandina parêka î ye . Brayê min î mezin . Taxeyek ji

taxeyên bajêr î dûr . Hespek ji hespên min î çêtir .

Parek î bê zayend e, cihên navên nêr û mê digire .

53 - Pêşkerên hejmarkî .

Pêşkerên hejmarkî ev in :

ek ji bona nêr û mê , yekejmar .

in ji bona nêr û mê , gelejmar wek :

Mirovek ango yek mirov .

Jinek an jinikek ango yek jin .

Mirovin ango nêr gelejmar .

Jinin ango mê gelejmar .

54 - Tewandina navan û tewandina pêşkerên hejmarkî .

Ji bona navan parekên tewandinê ev in :

î ji bona navên nêr yekejmar .

ê ji bona navên mê , yekejmar .

an ji bona nêr û mê gelejmar .

Nav tên tewandin gava :

a - têrkera navekî din e . Brayê Sînemê . Hespê Tacînî . Dengê zaroyan . Xortên Kurdistanê .

b - Gava daçekek hatiye danîn pêşiya navekî wek : Ji Hezargolê . Der Xwendegahê . Di bexçeyan de .

c - Gava nav kirdeya lêkerekê ye ( lêkereke sergeranî ) di demên borî de wek :

Sînemê got . Hevindî dît . Zaroyan xwar .

ç - Têrkera lêkereke sergeranî ye di demên niho û paş de wek : Ez Sînemê dibînim . Zaro di hewşan de dileyizin . Ew hevalan tîne mala xwe .

d - Gava têrkera negerandî hatiye danîn piştî lêkerê :

Ez brayê xwe tînim Wanê . Ez Ez diçim Diyarbekrê .

Min kitêbek da Sînemê .

Xweş bala xwe bidin û parekên veqetandekê û yên tewangê tev lî hev me kin . Parekên veqetandekê : ê a ên in . Parekên tewangê : î ê an in .

Di Mamê Sînemê de ê ya mam veqetandek e , heçi ê ya Sînemê tewang e .

Tewandina pêşkerên hejmarkî jî mîna navan e , her çend jî gava navê ko pêşkerek standiye tê wesifandin parek hinik diguhêrin wek :

Mirovekî baş lê jinikeke baş , mirovine baş , jinine baş . Ez mirovekî dibînim . Tu mehînekê di - kirî . Ew mehîninan dikire .

Nîşank . Hin navên nêr ko tê de tîpa a heye bi awakî xas jî dikarin bêne tewandin wek Axa , axê ; ba , bê ; welat , welêt , ban , bên û h. d.

55 - Rengdêr ango sifet .

Şeş texlît rengdêr hene : Rengdêrên çilobûn û çawabûnê , rengdêrên destdaniyê , ji wan rengdêran re rengdêrên xwedîtiyê jî tê gotin , rengdêrên pêşker , rengdêrên pirskerî , rengdêrên nebinavkirî , rengdêrên jmarîn .

Rengdêrên çilobûnê .

ɾ - Rengdêrên çilobûn û çawabûnê , herwekî me berî jî goti bû, ev bêje ne ko , ji me re , çilobûn û çawabûna navan didin zanîn wek: Kirêt , spehî , baş , nizm , xweş , nexweş , delal , sor , gewr , spî , fireh , teng , comerd , dilnerm , û h. d.

Hînker .

Gava ez hesp dibêjim her kes seh dike ko ez şanî heywa - nekî nas didim lê hêj kes ni zane û heye ko ji xwe bipirse gelo ev hesp ciwan e an pîr e , beza ye an ne beza ye , saxelem e an ne saxelem e , hespekî esîl e an hespekî adî ye , boz e . an kumeyt e , şê ye an qule ye ? Ev bêjeyên hanî ciwan , pîr , beza , nebeza , esîl , adetî , saxelem an nesaxelem hemî rengdêrên çilobûn û çawabûnê ne .

Xwendewarên me bê guman ji bîra ne kirine ko rengdêrên çilobûn û çawabûnê bêjeyeke neghêrbar e , her weke xwe dimînin .

56 - Rengdêrên destdaniyê .

Rengdêrên destdaniyê an xwedîtiyê ev rengdêr in ko ji me re didin zanîn mirov , heywan an tiştên ko em qala wan dikin yê , ya an yên kê ne .

Min, te , wî , wê , me , we ,wan rengdêrên destda - niyê ne wek : Xaniyê min . Kurê te , Manê wî . Hespê wê ,

Zaroyên wan . Bexçeyên me . Hevalên wî . Xwehên wê .
Pezên wan . Xwendegahên me . Zanîngehên we û h .d .
Rengdêra destdaniyê xwe .

Gava , di hevokekê de , têrker dikeve bal kirdeyê ve , rengdêra destdaniyê xwe dikeve cihê rengdêrên destdaniyê min , te , wê , wî , me , we , wan û ev jî , ji bona hemî kesan û gelejmaran bes e wek :
Min kurê xwe anî mal . Temo hevalê xwe gihaşt stasyonê . Ew zaroyên xwe tîn/xwendegaha destpêkî . Kurê min , bi hevalên xwe re , diçe zanîngehê . Hevalê min digel hevalên xwe hat mala me .

57 - Rengdêrên pêşker .

---

Rengdêrên pêşker bikêrî nîşankirina navan ango mirov , heywan û tiştan tên , cihê ko ew lê ne , heke ew nîzîk an dûr in , pêş me dikin .

Ev ji bona kes , heywan an tiştên nîzik .
Ew ji bona kes , heywan an tiştên dûr .

Herwekî : Min ev mirov dît . Te ev keçik nas kir ?
Ango mirov û keçik nîzik in .
Min ew mirov dît . Te ew keçik dît ? Ango mirov û keçik dûr in .

Şiklên tewandî yên rengdêrên pêşker ev in :

vî ji bona navên nêr nîzik , yekejmar .
vê ji bona navên mê , nîzik , yekejmar .
wî ji bona navên nêr , dûr , yekejmar .
wê ji bona navên mê , dûr , yekejmar .

van ji bona navên nêr û mê , gelejmar , dûr .
wan ji bona navên nêr û mê , gelejmar , dûr .

Wek : Ez vî mirovî dibînim . Ez vê keçikê dibînim .
Ez van mirovan dibînim . Ez van keçikan dibînim .
Ez wî mirovî dibînim . Ez wê keçikê dibînm .
Ez wan mirovan dibî nim . Ez wan keçikan dibînim .

Nîşank : Heke em dixwazin nîşankirina rengdêrên pêşker bixurtînin , şiklên jêrîn destê me de ne :

Ev...he ev..ha
Ew...he ew .. ha

Wek : Ev mirovê he . Ev keçika he .
Ev mirovên he . Ev keçikên he .
Ew mirovên he . Ew keçikên he .
Ev mirovên ha . Ev keçikên ha .
Ew mirovên ha . Ew keçikên ha .

58 - Rengdêrên pirskerî :

Rengdêrên pirskerî bikêrî pirskirinê tên û ew sisê ne :

Kîjan , çend , çi :

Wek : Kîjan mirov hat ? Kîjan jinikê got ? Saet çend e ? Tu çend salî yî ? Çi feleketek e ... Gelo hon çi mirov in ? Tu çi kes î ? We çend zaro hene ?

59 - Rengdêrên nebinavkirî .

---

Rengdêrên nebinavkirî ev rengdêr in ko navan bi awakî neronebar pêş me dikin .

Tu , filan , her , gelek , hevqas , herçî , hemî , zehf , çend , hîç û h. d . rengdêrine nebinavkirî ne .

Wek : Hemî mirovan digot . Min îro filan jinik dît . Hin gulçîçek bi şev vedibin . Heke hon şîreta mêraniyê didin , çend misalan bidin . Min ji xwe re çend hesp bijartin .Zaro hemî banî seydayê xwe dikin .

60 - Rengdêrên jmarîn .

---

Rengdêrên jmarîn ev rengdêr in ko navan bi hejmaran ronebar dikin .

Rengdêrên jmarîn du texlît in : jmarda û rêzda .

a - Rengdêrên jmarda hejmarên mirov , jin û mêr , heywan û tiştan pêş me dikin wek : Yek , du , sê , çar , deh , panzde , sed , hezar , milyon , milyar û h.d.

Hezar xwendegahên destpêkî . Du sed xwendegahên navîn . deh zanîngeh . 9 1 xwendegahên bilind . Deh pez . Not rojname . Du sed kovar . Deh hezar dersdar û mamoste û du sed zana û h. d .

Nîşank . Herwekî me dîtiye rengdêrên jmarda berî navî tê dayîn . Lêbelê , heke pirs li dem û saetê ye hejmar dikeve piştî navî wek :

Saet çend e ? Saet çar e . Saet çend e ? Saet neh kêm çaryekê ye . Saet heft û nîvan de .

Ji aliyê din heke rengdêrên jmarîn bi tena xwe ne û daçekek lê ye rengdêrên jmarîn têne tewandin wek :

Ji pêncan heta nehan . Temo di saet çaran de hat .Di sala hezar û neh û çaran de .

Jû pê ve , ger pêşiya hejmarê daçekek û piştî hejmarê navek heye , nav bitenê tê tewandin wek :

Min ev hesp bi neh zêran kirî

Herwekî em dizanin hejmar yek ji zayenda mê ye wek : Ji yekê heta bîst û yekê

Nîşank . Rengdêrên jmarda ji diduyan heta nozdehan gelejmarîn têne tewandin . wek :

Di saet heştan de . Di çil û çaran de . Der hezar û neh sed û pêncan de .

Bervajî ji 20 heta 90 û ji sedan , ji sedî heta neh sed û hezarî yekejmarîn têne tewandin wek :

Ji çilî bêtir . Ji sedî kêmtir . Ji pênc sedî bêtir . Ji hezarî kêmtir .

INSTITUT KURDE de PARIS BIBLIOTHÈQUE

b - Rengdêrên rêzda .

Wan du forme ango şikil hene :

Forma yekemîn : yekemîn , diwemîn , çaremîn , dehemîn , sedemîn , hezaremîn û h . d.

Forma diwemîn : Pêşîn an yekê , didiwan , siseyan , çaran, dehan û h. d.

Heçî rojên mehan ew bi awayê jêrîn e :

Yekê Gulanê 1970 . Bi kurtî : Yek. Gulan. I970.

61 - Pronav .

Pronav ev bêjeyek e ya ko cihê navî digire .
Tacîn hevalê te ye ? Belê , ew hevalê min e .
Bê dişwarî tê seh kirin ko di hevoka diwemîn dê pronav ew cihê Tacîn girtiye .
Bê guman , ne dikarî bû , em bibêjin : Belê , Tacîn hevalê min e , lêbelê herwekî dê bê dîtin pronav gelek cihan de zehf bikêr hatî ye .

62 - Pronavên kesîn .

Di zmanê kurdî de du texlît pronavên kesîn hene : yên netewandî û yên tewandî .

Pronavên ne tewandî :

Ez , tu , ew , em , hon ew .

Pronavên tewandî :

Min , te wî , wê , me , we , wan .

Hînker li ser pronavên kesîn :
Ez dineşim . Tu dibezî , Ew dibeze . Em dibezin . Hon dibezin . Ew dibezin .
Min dît . Te dît .Wî dît . Wê dît , Me dît . We dît . Wan dît .
Lêker bi wan pronavan têne kesandin .

63 - Pronavên destdaniyê .

Pronavên destdaniyê ev pronavên ko cihê na van digirin û ji me re didin zanîn xwediyê mirovekî , jin an mêrekî an heywan an tiştekî kê ye .
Pronavên destdaniyê ev in :

nêr

Yê min , yê te , yê wî , yê wê , yê me , yê we , yê wan

Yê xwe , yê xwe , yê xwe , yê xwe , yê xwe , yê xwe , yê xwe.

Mê .

Ya min , ya te , ya wî , ya wê , ya me , ya we , ya wan .
Ya xwe , ya xwe , ya xwe , ya xwe , ya xwe , ya xwe ,ya xwe .
Gelejmar, jibona nêr û mê :
Yên min , yên te , yên wî , yên wê , yên me , yên we , yên wan . Yên xwe , yên xwe û h.d.

Hînker : Mala te mezin e ? No , ya min piçûk e . Kitêba xwîşka te sor e ? No , ya wê kesk e . Mehîna wî ciwan e , lê ya min pîr e . Min kitêba xwe anî , çi re te ya xwe ne anî . Brayên te xebatker in , lê yên min tiral in .

## 64 - Pronavên pêşker .

Pronavên pêşker ev pronav in ko , mîna hemî pronavan cihê navî digirin , û mirov , heywan an tiştekî ko qala wî tê kirin pêşçav me dikin .

Ev in pronavên pêşker :

ev ji bona mirov , heywan û tiştên nîzik û
ew ji bona mirov , heywan an tiştekî dûr .

evê ha nêr , ... nîzik .
ewê ha nêr , dûr .

Eva ha mê , nîzik .
Ewa ha mê , dûr .

Ji bona nêr û mêr gelejmar :

Evên ha nîzik ,
Ewên ha dûr .

Pronavên pêşker têne tewandin /

Vî nêr , nîzik , yekejmar .
Wî nêr , dûr , yekejmar .

Vê mê , nîzik , yekejmar .
Wê mê , dûr , yekejmar .

Van nêr û mê , gelejmar nîzik .
Wan nêr û mê , gelejmar . dûr .

Nîşank . Tu vî mirovî dibînî ? Belê , ez vî dibînim . Herwekî we ^bê dişwarî seh kir , di hevoka pêşîn de vî rengdêreke pêşker e , mirovî pêş me dike , di hevoka diwemîn de pronavekî pêşker e , cihê navî girtiye .

65 - Pronavê girêkî .

pronavê girêkî navê ko cihê wî girtiye digihîne navê paşdetir . Ev pronav ko ye wek :
Mirovê ko dilê wî pak e , her bextiyar e . Mirovê ko hat ne hevalê min bû .

66 - Pronavên pirsiyarî .

Kî , çî , kîjik , kîjan pronavên pirsiyarî ne û têne tewandin .
Hînker : Kî hat ? Kê got . Tu kîjikê dixwazî .
Tu kîjikê dixwazî . Hon kîjan dixwazin .

67 - Pronavên nebinavkirî .

Pronavên nebinavkirî mirov , jin û mêr , heywan û tiştan ne bi rondarî lê hinik bi awakî xumamdar , amdagirtî pêş me dikin wek : hemiyan got . Yekî digot .Tu kes ni zane ! Heçî ji welatê xwe hez dike .
Pronavên nebinavkirî sê kom in :

a - Heryek , yek , her kes , tu kes , her tişt , tu tişt , filan , filan kes û h. d.
b - Hemî , hin , hinek , çendek û h. d .
C - Heçî , behvan , çend , filan û behvan , tu , gî , giş, hîç , filan û filan , hev , hev û du .

Pronavên koma A gelejmarîn têne tewandin wek navan . Pronavên koma B gelejmarîn têne tewandin mîna navan . Pronavên koma C na yên tewandin .

Hînker : Yek hat . Yekî digot . Yekê dît . Yekî dixwar , Yekê digot ... yekî . Min tu tişt ne dît . Ez tu kesî nas na kin . Ez di vî bajarî de tu kesî nas na kim . Tu kesî ne got . Min ew ji tu kesî re ne got . Tu tişt nî ne . Min ji her kesî bihîst . Her tişt hazir e . Her tişt hatiye pêk anîn . Heçî ko vî tiştî dibêje . Hinekan got . Hin dereng hatin . Min bi yekî re axaft ,

Hin jiyîna xwe bi xweziyan derbas dikin . Ez ji hevalên xwe hinekan dibînim . Me bêje filan û behvan , yek bi yek bi nav bike .

68 - Pronavê bîrdar .

Pronavê bîrdar xwe ye/ji bona sê kesên yekejmar û gelejmar û ji bona nêr , mê mîna hev e .

Hînker . Ez xwe dişom . Hon xwe dibînin . Bala xwe bide dersa xwe . Tu kes li ba xwe ne pêxember e . Kurê ko ji bona bavê xwe dixebite , ji bona xwe dixebite .

Min ji xwe re ev xanî kirî . Rûyê xwe ji xelkê bamede .

69 - Pronavên hevdudîtiyê .

Pronavên hevdudîtiyê hev û hev û du ne wek : Em hev û du dibînin . Hon hev û du nas dikin . Ji hev û du hez bikin .

70 - Pronavên nebinavkirî yên hevedidanî .

Şiklên pronavên nebinavkirî yên hevedudanî ev in :

Ez bi xwe , tu bi xwe , ew bi xwe , em bi xwe , hon bixwe , ew bi xwe .
Min bi xwe , te bi xwe , wî bi xwe , wê bixwe , me bi xwe , we bi xwe , wan bi xwe wek :
Ez bi xwe çûm . Wî bi xwe got . Ew bi xwe hat . Hon bi xwe dibînin .

71 - Pronavên kurt'-î

Pronavên kurtkirî dido ne : ê an yê û î .
Ev pronav yekejmar in û cihê navên nêr û mê digirin .
wek : Te ji hevalê xwe re got ? Belê , min got ê . Te hespê xwe da brayê xwe ? Belê , min da yê . Hevalê min î hêja . Hespek ji hespên min î beza .

72 - Pronav û daçekên hevgirtî .

Di zmanê kurdî de hin daçek û pronavên kesîn wî an wê digehin hev û di axaftin û nivîsandinê de sivikahî û ahengdariyekê pêk tînin .

a - bi wî an bi wê digehin hev û dibin pê .
Tu bi kurdî dizanî ? Belê , ez pê dizanim .

b - Bi wî re an bi wê re digehin hev û dibin pê re .
Tu digel brayê xwe çûyî gund ? Belê , ez pê re çûm .
Tu bi bavê xw e re çûyî Diyarbekrê ? Belê , ez pê re çûm .

C - Ji wî an ji wê digehin hev dibin jê .
Te ev xeber ji Brayê xwe bihîst ? Belê , min jê bihîst .

Ç - Di wî an di w^de digehin hev û dibin tê de .
Dersdar di dersxaneyê de ye ? Belê , ew tê de ye .

73 - Lêker ango fiil .

Lêker ev bêje ye ko em bi arîkariya wê qala kesan , heywanan , tiştan , armançan , daxwazan nûçe û bûyeran dikarin bikin .

Bi gotinên din lêker can dide axaftin û nivîsandinê . Bê wî em ni karin qala bûna xwe , hyîna xwe , kirina xwe , kirinên xelkê ,fikir û armancên xwe bidin zanîn .

Gava ez dibêjim : Temo xortekî hişyar e . ev e ko didawiya hevokê de ye lêker e . Gava tu dibêjî : Min sêvek xwar . Ev j xwar lêker e .

Lêkerek xwe bi xwe dide zanîn : Bêjeyek heke lêker e an ne bi sivikahî tê seh kirin ji ber ko lêker bi tenê tê kesandin an go tesrîf kirin . Heke ez dikarim pêşiya bêjeyekê pronavên ez , tu , ew , em , hon , ew an formeyên wan ên tewandî min , te wî , wê , me , we, wan deynim , hema eşkere dibe ko ev bêje lêker e wek : çûn , hatin , dîtin , gotin , anîn , danîn , ketin û h . d.

Ew çûn . Ew hatin . Wan dît... Wan got... Wan anî.. , Ew ketin . Ez dibêjim . Ew dixwe û h. d... an
Min dersa xwe xwend . Ew ji bajêr tê . Te çi got .

Min derî vekir . Ez diçim Kurdistanê .Îro dinya germ e .

Ez ji trênê peya bûm . Ez ni karim vî barî hilgirim .

Yê ko got û kir mêr e , Yê ko ne got û kir şêr e ,
yê ko got û ne kir kerê bêkêr e .

74 - Kirde .

Kirdeya lêkerekê ev kes , heywan an tiştek e ko lêker rewiş.. , hal , an gotin û kirina wî pêş ne dike .
Gava em dibêjin : Hesp dibeze . Di vê hevokê de du bêje hene : Hesp û dibeze . Heke ne pirsî : Kî dibeze ? Bersîva wî hesp e . AngoHesp kirde ye û dibeze lêker .
Sê direye . Kî direye ? se,ango se kirde û direye lê - ker e .
Kirdeya lêkerekê dikare bibe : Navek , bêjeya ko hate hesibandin mîna navek an lêkerek di raweya raderî de .
Gava em dibêjin : Roj dibiriqe . Roj , navek , dibiriqe lêkerek .
Pênc û çar dikin neh . Di vê hevokê de , rengdêrên hej- marda hatine hesibandin navek . Pênc û çar bûne kirdeya

lêkera dikin .

Em dixebitin . Em pronav , kirde , dixebitin lêker . Derewkirin kirêt e . Derewkirin , kirde , kirêt , rengda , e , lêker .

75 - Têrker .

Bivê nevê tiştê ko kirde kiriye an gotiye , an dike , an dibêje , an pêk aniye û lêker da , an dide zanîn dikeve ser kesekî , heywanekî an tiştekî.

Gava ez dibêjin : Sînemê xwar xuya dibe ko jin an keçikek heye bi navê Sînemê û vê jinkê an keçikê tiştek xwar lê hêj em ni zanin wê çi xwar . Lê heke me pirsî : Gelo Sînemê çi xwar ? û me got : Sînemê sêvek xwar hingî mana hevokê timam dibe .

Li vir sêv mana hevokê timan kir an go ev bje sêv têrker e .

Hînker . Min dersa xwe xwend . Zaro di hewşê de dileyizin . Temo çû nêçîrê . Ew çû bayezîdê .

| Kirde . | têrker . | lêker . |
|---|---|---|
| Min | ders | xwend |
| Zaro | hewş | dileyizin . |
| Temo | nêçîr | çû |
| Ew | Bayezîd | çû |
| Sînem | sêv | xwar . |

76 - Têrkera gerandî .

Têrker du texlît in : Têrkera gerandî û têrkera negerandî .

Destpêkî em ê bi têrkera gerandî mijûl bibin . Têrkera gerandî ev bêje ye ko kirina lêkerê ango kirina ko lêker pêş me dike , ji me re dide zanîn rast bi rast dikeve ser wê an go bê 'arîkariya daçekekê mîna :

Sîn
Sînemê sêvek xwar . Sînem keça xwe maç dike . Mêrxas welatê xwe diparêze . Zaro di dersxaneyê de dixebitin . Min hevalê xwe dît .

Gava em dixwazin bizanin kîjan bêje têrker e , têrkera gerandî , em dipirsin :

Sînemê çi xwar ? Sêvek . Li vie sêv têrkera gerandî ye . Mêrxas çi diparêzin ? Welatê xwe . Welatê xwe têrkereke gerandî ye . Temo kî dît ? Hevalê xwe , li vir heval têrkereke gerandî ye .

77 - Têrkera negerandî .

---

Têrkera negerandî ev bêje ye ko kirina lêkerê , rast bi rast , na yê xe ser . Têrkera negerandî bitenê bi destê daçekekê digehe lêkerê .

Hînker ; Ez li Diyarbekrê rûdinim . Temo ji bajêr tê . Herwekî hon dibînin di van du hevokên jorîn de têrker bi destê daçekên li û ji gihaye lêkerê ango ev du têrkerên jorîn têrkerên negerandî ne .

Ez li Diyarbekrê rûdinim .

Kirde .Pronav .

---

li daçek .

---

Diyarbekir . têrker

---

rûdinim lêker .

Temo Kirde , ji daçek , Gund têrker , tê lêker .

Di zmanê kurdî de gava têrker piştî lêkerê tê dayîn daçek ne hewce ye û para dawîn ya biwêja daçekî tê dayîn lê her hal nav divê bête tewandin .

78 - Kifşdarî .

---

Gava têrkera negerandî biserxistin kifşdariyek anîna cih ,

wext , dem , sebeb , hêncet mana lêkerê biser ve tîne, jê re têrkera kifşdaniyê tê gotin .

Peyda kirina têrkera kifşdanyê bi pirsên jêrîn dikeve dest : li kû , kengê , çawan , çire û h. d.

Gava em dibêjin : Ez li Mûşê di xebitim . Pirs ev e : Tu li kû di xebitî ? Li Mûşêango - li Mûşê - têrkereke kifş - daniyê ya cihkî ye .

Roja duşembê ez ne li mal bûm . Tu kengê ne li mal bû ? Roja duşembê . ango têrkera kifşdaniyê ya wextê roja duşembê ye . Tu çawan dixebitî ? Ez bi xeyret dixebitim , ango têrkera kifşdaniyê ya awayî - bi xeyret e .

79 - Kesên lêkerê .

---

Di lêkerekê de sê kes hene :

Yê ko daxêva an tiştekî dike .
Yê ko jê re tê gotin .
Yê ko qal , gotin li ser wî ye .

Ev sê kesên jorîn yekejmar in .

Heçî yên jêrîn gelejmar in .
Yên ko daxêvin . Yên ko ji wan re tê gotin .
Yên ko gotin li ser wan e .

Herwekî :

Ez dibêjim . Tu dibêjî . Ew dibêje .
Em dibêjin . Hon dibêjin . Ew dibêjin .

Ez dikim . Tu dikî . Ew dike . Em dikin . Hon dikin . Ew dikin .

Min got . Te got . Wî got . Wê got . Me got . We got . Wan got .

80 - Pêkhatina lêkerê bi kirdeya xwe ve .

---

Bi awakî andagirtî lêker ji aliyê kes û hejmarê bi kirdeya xwe ve pêk tê . Heke kirde yekejmar e , lêker jî yekejmar e . Heke kirde kesê yekemîn e , lê ker jî dike - ve vî qiklî herwekî :

[illegible] . [illegible] .
[illegible] digim . [illegible] digin .

Ez dixwim . Hon dixwin .
Ez dikevim . Hon dikevin .
Ew dike . Hon dikin . û h , d .

Nîşank . Heke kirdeyeñ lêkerê ji yekê bêtir in , lêker dikeve şiklê gelejmarîn :

Hesp dibeze . Hesp û mehîn dibezin . Ez û hevalê xwe , em hatin .

Divê tu sibe herî gundê bavê xwe .

Zarono , divê hon sibe herin gundê bavê xwe .

Nîşank . Lê di demên borî yên lêkerên sergeranî de , lêker bi têrkerê ve pev tê ango heke têrker gelejmarîn , vî tiştî lêker dide zanîn . Ji aliyê din heke kirde gelejmarîn e , vê tevang dide zanîn . Hevokên jêrîn vî tiştî pêş me dikin .

Keçikê got . Keçikan got . Zaro dît . Zaroyan dît .
Kirde ketiye şiklê gelejmarîn , lêker weke xwe maye .
Keçikê sêvek xwar . Keçikê du sêv xwarin .
Sînemê mirovek dît . Sînemê mirov dîtin .
Min sêv xwar . Min sêv xwarin . Min sêvek xwar .
Min sêvin xwarin .

8I - Rawe .

Rawe şikl anawayê kirina lêkerê pêş me dike .

a - Raweya rader .
b - Raweya pêşker .
c - Raweya hekînî .
ç - Raweya bilanê .
d - Raweya fermanî .
e - Raweya parnihayî .
ê - Raweya çêbiwar

82 - Rader .

Rader ev bêje ye ko lêker jê hil tê .wek : kirin , avêtin , hatin , dan , dîtin , razan , raketin , gotin ,

Nivîsandin , avêtin , danîn , kuştin , firotin û h. d.
Dawîneyên raderan dido ne : in û n .

Heke rader bi dendarekê diqede dawîneya wê in
heke bi dengdêrekê diqedawîneya wê n e .

Kirin , avêtin , gotin , xwarin , vexwarinû h.d.

Dan , çûn , bûn , hebûn , anîn , kirîn û h . d .

82 - Raweya pêşker .

Raweya pêşker : gava em tiştekî pêşçavan dikin , didin dîtin , pirsekê dikin bi raweya pêşker kar dikin wek : Ez diçim . Wî xwar . Me dît . Ez ê herim . Ez dixwînim . Ez nexweş bû bûm . Te li mal çi dikir ? Em ê herin Kerkkûkê . Wê hevala xwe dît . Duhî êvarê em çûn sînemayê . Min îro rojname ne xwend . Brayê min hêj ne hat . Ew çire na çe . Em ê sibe herin xwendegahê .

83 - Raweya hekînî :

Gava kirin an qewimandina tiştekî bi şertekê girêdayî ye wek : Pereyê min hebiwa , min ê hespek bikira . Otomobîlek hebiwa , ez ê biçûma ba hevalê xwe .

84 - Raweya bilanî .

Gava kirina ko lêker pêş me dike bi daxwazek an gumanek girêdayî ye wek : Heye ko ez herim Wanê . Min dixwest ez bêm ba te . Min divê îşev ez herim Siirtê .

85 - Raweya fermanî .

Gava di lêkerê de qesda fermankirinê , emirdanê heye wek : Here , were , bibêje , bibêjin , herin , bigirin û h. d. bêguman we seh kir : were , yekejmar , werin , gelejmar e .

86 - Raweya Parnihayî .

Raweya parnihayî bêjeyek e/ya ko ji lêker û rengdêran parmend e , ji ber ko pirî car çilobûn û çawa bûna ... mirovan , heywanan û tiştan , hal û rewişa wan pêş me dike mîna : Di xewê de . Di xwendinê de . bi girînê û h.d.

87 - Raweya çêbiwar .

Raweya çêbiwar bi danîna parêka î dawiya bêjeyê tê çêkirin wek : gotî , vexwarî , dîtî , kirî û h.d.

88 - Nîşandek .

Bi danîna nîşandekan mana hevokê li hev bider tê , miraz , û daxwaza hevokê çêtir tê seh kirin û di xwendinê de cihên rawestana wê ango sekinandina wê ên kut û drêj bi hêsanî tên zanîn .

Nîşandekên hevokan ev in :

Bihnok ( ; ) .

Bihnok işareta sekinandinê bi qasî bihnekê ye . Di hevokekê de , jê kurtir sekinandin nî ne.Bihnok tê danîn :

a - navbeyna navan û rengdêran , gava ev bêje di pey hev de ne wek : Welatên Japon , Hindistan , ... , Erebistan û Kurdistan di Asyayê de ne .
Temo , Cangîr , Hevin û 'Etman brayên hev in . Hesp, mehîn û hêştirên min ciwan , beza û spehî ne . Ez ji nan , penîr , zeytûn û pîvazê hez dikim . Di Rojavayî de ezman sor de, zer , heşîn û gewr dibe .

b - Di nav qetên hevokê yên koli pey hev girêdayî ne wek : Memo , gava dengê brayê xwe bihîst, hema hat. Reya ezmanan berwar e , ne kaş e , ne kendal e , hema her ... wê bêje .

c - Navbeyna du perçeyên hevokê de , gava di vê hevokê de çêbûna karekê bi şertekî ve girêdayî ye wek : Xweş bixebite , tu dê bibînî ko xebat şîrîn e . Dido bi hev re rast bin , yê siseyan Xwedê ye .

ç - Di nav beyna qetên hevokekê de , gava di vê hevokê de tiştek tê tarîf kirin wek :
Di vî xwaniyî de sê mezel , bîst pencere , çar derî û navderek heye .

d - Gava ji hevokekê bêjeyek tê avêtin , cihê vê bêjeyê dihnokek digire wek : Bexçeyê min mezin e , pehniya wî deh , drêjiya wê bîst û pênc mêtro ye. Di vê hevokê de bihnok , cihê mêtroyê digire .

e - Gava di hevokekê de bêjeyek tê ducarkirin wek: Bixebite , bixebita tu ê hîn bibî .

ê - Gava em dikin ango dixwazin gotina yekî bibirin wek : Bes , dev ji min berde .

Rawestbihnok .

Gava hevokek ji du perçeyan hevedidanî ye û birê pêşîn mana qetê paşîn timam dike an tiştekî din bi ser ve zeyde dike ; navbeyna van piçkan de rawst - bihnok tê danîn wek : Bi tenê bi tifing û xenceran xebat na qede ; divê tu fêrî xwendin , nivîsandin û zanînê jî bibî .

Durawest .

Du rawest tên danîn :

a - Piştî perçehevokekê ya ko bîrhatinek tîne pêş wek : Tu kes ni kare bibêje : Ez yekcar bextiyar im .

b - Berî hevokekê ya ko mana hevoka pêşhatî dikemilîne wek : Berde , bila bodile bibêjin : Zanîn bi bihayê xwe ye .

C – Berî an piştî peyhevgotinekê ko hevokek pê destpê dike an diqede wek :

Eve dîroka me bi sê bêjeyan : Zayîn , ezabdîtin û mirin .

Bi awakî din : Zayîn , ezabdîtin , mirin : eve dîroka me bi sê pirsan .

Rawest .

Li dawiya her hevokê divê rawestek bê danîn wek :
Derew êwî ne . Hiş tacekî zêrîn e , li serê her kesî nî ne .Ne konê bê pez , ne gundê bê rez , ne mirovê ko dibêje ez û ez . Desthilanîn fereca xeyrê ye .
Carina bêjeyek an dido têne kurt kirin û bi tenê tîpên wan ên destpêkî tên nivîsandin ; hingî piştî wan tîpan divê rawestek bê danîn wek :
Partî Demokratî Kurdistan . P . D . K .

Rawestên peyhev .

Rawestên peyhev tên danîn gava ji niqa ve ramanek ango fikrek an tejîdilek anr heyecanek bi ser me de tê û bernade ko em ê hevoka xwe biqedînin wek :
Heçî hon ... ez ê sibe , ji were , bibêjim hon çi ne .

Nîşandeka pirsê .

Gava di hevokekê de tiştek tê pirsîn , li dawiya vê hevokê nîşandeka pirsê tê danîn wek :
Gelo Temo hat ? Tu çire na xwî ? Tu jî , bi me re , herî nêçîrê ?

Nîşandeka hêdanê .

Gava hevokek an di hevokekê de bêjeyek ecêbmayîn , tirs , firehî an fermanekê nîşa me dide , paş vê hevokê an bêjeyê nîşandeka hêdanê tê danîn wek :
Wey li min ezo ! Bibeze lo ! Wî mirovî werîne !
[illegible] ! [illegible] ! [illegible] !
[illegible]

Wey li min porkurê ! Wey lo dilo ! Wey lo dilo !

Nîşandeka pênekan ( - - ) .

Gava ji hevokekê re tiştekî welê tê biser/ve kirin zeyde ko ê wî jî mana hevokê timam e û bi rakirina wî mana wê xira na be , li pêş û paşiya vê gotinê re , pênekan tên danîn wek :

Fîl - ev heywanê hewqas stûr û qelew - ji himhima berazan direcife .

Di hevoka jorîn de me tinê bigota : Fîl ji himhima berazan direcife . mana hevokê timam e û bi raki - rina perçeyê " ev heyvanê hinde stûr û qelew " mana wê seqet na be .

Nîşandeka dunikan : " " .

Gava di nivîsanekê de birek ji gotin an nivîsandina kesekîdin tê ducarkirin ji destpêk û xelaseka vî perçeyî re dunikan tên danîn wek :

" di dinê de reyek heye ev jî reya rastiyê ye " .

Herwekî hevoka jorîn gotina Zerdeşt e,tê dunikan kirin .

Nîşandeka axaftinê .

Gava di nivîsarekê de birek jê di şiklê axaftinê de hatiye nivîsandin , ji destpêka her gotin an komgotinê nîşandeka axaftinê tê danîn wek : Hevind ji Kerevon re got :

- Were , em herin .

Kerevon lê vegerand û got :

- No , ez na yim .

Mizgîniyê dan kerî , gotin :

- Dehşik ji te re bû .

Kerî got :

- Êmê min kêm bû , barê min bêtir bû .

Nîşank . Gava bêjeyek ji kêmaniya cih di rêzekê de divê bibe du bir , ji dawiya perçeyê re bendikek tê dayîn,herwekî we di vê kitêbê de ev tişt pirîcar dîtiye .

Kevane . (     )

Kevane di nav hevokê de , bi kêrî bi cihkirina bêjeyan tê yên ko ji aliyê sehkirina hevokê ne bingehîn angin esasî ye , lêbelê hatine danîn ji bona bîranîna ramanekê wek :Gur ( herwekî divê em rastiyê bibêjin ) her dijminê pezan bûn .

89 - Ji hevkirina lêkeran .

Lêker , herwekî me berî ji goti bû bêjeyek e ya ko hal , rewiş , heyîn , bûn an ne bûna me , xwestekên me û h. d. dide zanîn . Bê vê axaftin çênabe .

Ji hevkirina lêkerên kurdî bi awayê jêrîn e :

Kom 1 . Li gora binyada wan :

a - Lêkerên arîkar .

b - Lêkerên sade ... rənî .

C - Lêkerên hevedudanî .

Ç - Biwêjên lêkerî .

Kom 2 . Li gora kardaniya wan .

a - Lêkerên sergerandî .

b - Lêkerên pêgerandî .

C - Lêkerên pronavkî .

Ç - Lêkerên nekesanî .

Kom 3 . Li gora şiklên wan .

a - Lêkerên biserve hatî .

b - Lêkerên nebiserve hatî .

Lêkerên arîkar .

Lêkerên arîkar du texlît in :

a - Bi yên ko demên hevedudanî têne çêkirin û kesandin wek : Lêkera Bûnê.

b - B/yên ko lêkerine hevedudanî yên arîkar têne çêkirin wek : Hatin , dan û h.d.

90 - Lêkera arîkar : bûn

Kesandina lêkera arîkar bûn .

Raweya rader : bûn .

Raweya pêşker . Demên Lêkerê .

| Dema niho | Dema paş . | Boriya berdest . |
|---|---|---|
| Ez im . | Ez ê bibim . | Ez dibûm . |
| Tu î . | Tu ê bibî . | Tu dibû . |
| Ew e . | Ew ê bibe . | Ew dibû . |
| Em in . | Em ê bibin . | Em dibûn . |
| Hon in . | Hon ê bibin . | Hon dibûn . |
| Ew in . | Ew ê bibin . | Ew dibûn . |

| Boriya têdayî . | Boriya çîrokî . |
|---|---|
| Ez bûm . | Ez bû bûm . |
| Tu bû . | Tu bû bû . |
| Ew bû . | Ew bû bû . |
| Em bûn . | Em bû bûn . |
| Hon bûn . | Hon bû bûn . |
| Ew bûn . | Ew bû bûn . |

Briya dûdar an boriya sade .

Ez bûme .
Tu bûyî .
Ew bûye .
Em bûne .
Hon bûne .
Ew bûne .

Raweya hekînî . Dema borî I .

Ez bûma . Tu bûya . Ew bûya . Em bûna . Hon bûna
Ew bûna .

Dema borî / Forma II

Ez dê bibûma . Tu dê bibûya . Ew dê bibûya . Em dê bibûna .

Hon dê bibûna , Ew dê bibûna .
Raweya bilanî .

Boriya berdest . Ez bû biwam . Tu bû biwa . Ew bû-
Biwa . Em bû biwan . Hon bû biwan . Ew bû biwan .
Dema niho û paş , forma I .

Ez bibim . Tu bibî . Ew bibe . Em bibin . hon bi-
bin . Ew bibin .
Forma II.
Ko ez bin . Ko tu bî . Ko ew be . Ko em bin . Ko hon bin
Ko ew bin .
Raweya fermanî . Be an bibe . Bin . bin . Her du şik-
lên dawîn gelejmar în .Neyînî : me be , me bin ,me bin.

Nîşank .
1 - Neyîniya dema paş nî ne .
2 - Serdanî ev bêje ye ko reng û gewher û çawabûna .
kirdeyê pêş me dike û bi lêkera bûnê digehe wê wek:
Dicle fireh e.Zêr maden e . Ev hesp yê cîranê min e .
Ji hînkera jorîn tê seh kirin ko serdanî dikare bibe reng-
dêrek : Rovî hîlekar e .
Navek . Zêr maden e . Pronavek : Ev hesp yê cîranê
min e .
3 - Heke tîpa dawiya serdanî dêngdêrek e , forma lê-
kera bûnê, di dema niho de,diguhêre û dikeve şiklê
jêrîn :

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Ez | im . | dibe | Ez | me . |
| Tu | î . | dibe | Tu | yî . |
| Ew | e . | dibe | Ew | ye . |
| Em | in . | dibe | Em | ne . |
| Hon | in . | dibe | Hon | ne . |
| Ew | in . | dibe | Ew | ne . |

Wek : Ez kurd im lê hevalê min polonî ye . Em kurd in
lê cîranên me emerîkanî ne . Ez pêşmerge me .

4 - Ji aliyê din heke me cihê serdaniyê guhart û me danî piştî lêkerê 'ango lêkera bûnê mana diguhêre : Ez nexweş bûm . Ez bûm nexweş . Ez seyda bûm . Ez bûm seyda û h . d .

91 - Parekên neyînê .

Pareka neyînê bona lêkera [illegible] , ji lêkera hebûnê pê ve , ji bona hemî lêkeran , di demên borî de, ne ye wek : Yê ko ev şerbik şkênand tu î ? No , [illegible]
ne ez im . Tu Tacîn î ? No , ez ne Tacîn [illegible]
im , ez pismamê wî me .

Herwekî tê dîtin bê serdanî pareka neyînê tê danîn berî lêkerê lê bi serdanî piştî kirdeyê .

92 - Lêkera hebûnê .

---

Rawe û kesandina lêkera hebûnê .

Raweya rader . Hebûn .

Raweya pêşker .

| Dema niho. Erînî . | Neyînî . |
|---|---|
| Min heye . | Min nî ne . |
| Te heye . | Te nî ne . |
| Wî heye . | Wî nî ne . |
| Wê heye . | Wê nî ne . |
| Me heye . | Me nî ne . |
| We heye . | We nî ne . |
| Wan heye . | Wan nî ne . |

Dema paş : Min dê hebe . Te dê hebe . Wî dê hebe . Wê dê hebe . Me dê hebe . We dê hebe . Wan dê hebe .

Boriya têdayî , erînî .

Min hebû , te hebû . Wî hebû . Wê heû , me hebû . We hebû . Wan hebû .

Neyînî . Min ne bû . Te ne bû. ?Wî ne bû . Wê ne bû . Me ne bû . We ne bû . Wan ne bû .

Min tu ne bû . Te tu ne bû . Wî tu ne bû . Wê tu ne bû Me tu ne bû . We tu ne bû . Wan tu ne bû .

Boriya dûdar .

Min hebûye . Te hebûye . Wî hebûye . Wê hebûye . Me hebûye . We hebûye . Wan hebûye .

Pareka neyînî : ne ye .

Boriya çîrokî .

Min hebû bû . Te hebû bû . Wî hebû bû . Wê hebû bû . Me hebû bû . We hebû bû . Wan hebû bû .

Pareka neyînî dîsa ne ye .

Raweya hekînî .

Dema borî.Forma .I . [illegible] II .

Min hebiwa . Te hebiwa . Wî hebiwa . Wê hebiwa . Me hebiwa . We hebiwa . Wan hebiwa .

Dema borî , Forma II .

Min dê hebiwa . Te dê hebiwa . Wî dê hebiwa . Wê dê hebiwa . Me dê hebiwa . We dê hebiwa . Wan dê hebiwa .

Raweya bilanî .

Boriya berdest .

Min hebe . Te hebe . Wî hebe . Wê hebe . Me hebe . We hebe . Wan hebe .

Dema niho .

Min hebê . Te hebê . Wî hebê . Wê hebê . Me hebê We hebê . Wan hebê .

Raweya fermanî .

Hebe . Hebin . Hebin . Neyînî : Me be . Me bin .
Me bin .

Lêkera heyînê. Raweya rader; Heyîn . Raweya pêşker .

Lêkera heyîné ./ Dema niho . Ez heme . Tu heyî Ew heye .

Em hene . Hon hene . Ew hene .

Boriya têdayî . Ez hebûm . Tu hebû . Ew hebû . Em hebûn . Hon hebûn . Ew hebûn .

Boriya dûdar . Ez hebûme . Tu hebûyî . Ew hebûye . Em hebûne . Hon hebûne . Ew hebûne .

Boriya çîrokî . Ez hebû bûm . Tu hebû bû . Ew hebû bû . Em hebû bûn . Hon hebû bûn . Ew hebû bûn .

Dema paş . Ez dê hebim . Tu dê hebî . Ew dê hebe .

Em dê hebin . Ew dê hebin . Hon dê hebin .

Raweya hekînî . Dema borî . Forma I .

Ez hebûma . Tu hebûya . Ew hebûya . Em hebûna .
Hon hebûna . Ew hebûna .

Raweya hekînî . Forma II .

Ez dè hebûma . Tu dê hebûya . Ew dê hebûya .
Em dê hebûna . Hon dê hebûna . Ew dê hebûna

Raweya bilanî . Boriya berdest .

Ez hebû biwam . Tu hebû biwa . Ew hebû biwa . Em hebû biwan . Hon hebû biwan . Ew hebû biwan .

Raweya bilanî . Dema niho û paş .

Ez hebim . Tu hebî . Ew hebe . Em hebin . Hon hebin . ew hebin . Forma II . Ko ez hebim.Ko tu hebî ko ew hebe û h.d.

Raweya fermanî .

Hebe . Hebin . Hebin . Neyînî / Me be . Me bin .
Me bin .

93 - Lêkerên sade [illegible]

[illegible] lêkerên ko xweser in wek :
Kirin , gotin , anîn , danîn , avêtin , şuştin ,
[illegible] dan , xwarin û h. d.

94 - Kesandina lêkera [illegible] kirin .

Raweya rader : Kirin .
Raweya pêşker .

Boriya têdayî .

Min kir .
Te kir .
Wî kir .
Wê kir .
Me kir .
We kir .
Wan kir .

Boriya dûdar .

Min kiriye .
Te kiriye .
Wî kiriye .
Wê kiriye .
Me kiriye .
We kiriye .
Wan kiriye .

Boriya berdest .

Min dikir .
Te dikir .
Wî dikir .
Wê dikir .
Me dikir .
We dikir .
Wan dikir .

Boriya çîrokî .

Min kiri bû .
Te kiri bû .
Wî kiri bû .
Wê kiri bû .
Me kiri bû .
We kiri bû .
Wan kiri bû .

Formayên wan ên neyînî .

Min , te , wî , wê , me , we , wan ne kir .
Min , te , wî , wê , me , we wan ne kiriye .
Ên nayîn jî bi pareka ne dikevin şiklê neyînî .

| Dema niho . | Dema paş . |
|---|---|
| Ez dikim . | Ez ê bikim . |
| Tu dikî . | Tu ê bikî . |
| Ew dike . | Ew ê bike . |
| Em dikin . | Em ê bikin . |
| Hon dikin . | Hon ê bikin . |
| Ew dikin . | Ew ê bikin . |

Forma neyînî . Ez na kim . Tu na kî . Ew na ke ,
Em na kin . Hon na kin . Ew na kin

Nîşank . Forma neyînî ya dema paş nî ne :
Tu ê vê nameyê binivîsî ? No , ez na nivîsim, ;
ango bersîv bi dema niho tê dayîn .

Raweya hekînî .

Dema borî .

| Forma I . | Forma II. |
|---|---|
| Min bikira . | Min dê bikira . |
| Te bikira . | Te dê bikira . |
| Wî bikira . | Wî dê bikira . |
| Wê bikira . | Wê dê bikira . |
| Me bikira . | Me dê bikira . |
| We bikira . | We dê bikira . |
| Wan bikira . | Wan dê bikira . |

Raweya bilanî .

Boriya berdest .

Min kiri biwa . Te kiri biwa . Wî kiri biwa .
Wê kiri biwa . Me kiri biwa . We kiri biwa .
Wan kiri biwa .

Hemî demên şiklên neyînî yên raweya bilanî bi pareka ne têne çêkirin .

Dema niho û paş .

| Forma I . | Forma II. |
|---|---|
| Ez bikim . | Ko ez kiri bim . |
| Tu bikî | Ko tu kiri bî . |
| Ew bike . | Ko ew kiri be . |
| Em bikin . | Ko em kiri bin . |
| Hon bikin . | Ko hon kiri bin . |
| Ew bikin . | Ko ew kiri bin . |

Raweya fermanî . Bike . Bikin . Bikin . Me ke . Me kin . Me kin .

Lêker [illegible] ketin .
[illegible] . Ew jî sade û xweser in .

Raweya rader :Ketin .

Raweya pêşker .

| Boriya têdayî . | Boriya dûdar . |
|---|---|
| Ez ketim . | Ez ketime . |
| Tu ketî . Ew ket (e) . | Tu ketiyê . Ew ketiye . |
| Em ketin . | Em ketine . |
| Hon ketin . | Hon ketine . |
| Ew ketin . | Ew ketine . |

INSTITUT KURDE de PARIS BIBLIOTHÈQUE

| Boriya berdest . | Boriya çîrokî . |
|---|---|
| Ez diketim . | Ez keti bûm . |
| Tu diketî . | Tu keti bû . |
| Ew diket . | Ew keti bû . |
| Em diketin . | Em keti bûn . |
| Hon diketin . | Hon keti bûn . |
| Ew diketin . | Ew keti bûn . |

Nîşank . Neyîniya hemî demên borî lêkerên pêgeranî jî bi pareka ne tên çêkirin ..

| Dema niho . | Dema paş . |
|---|---|
| Ez dikevim . | Ez ê bikevim . |
| Tu dikevî . | Tu ê bikevî . |
| Ew dikeve . | Ew ê bikeve . |
| Em dikevin . | Em ê bikevin . |
| Hon dikevin . | Hon ê bikevin . |
| Ew dikevin . | Ew ê bikevin . |

Pareka neyîniyê ji bona dema niho na ye .

Raweya hekînî .

Dema borî .

| Forma I . | Forma II . |
|---|---|
| Ez biketama . | Ez dê biketama . |
| Tu biketaya . | Tu dê biketaya . |
| Ew biketaya . | Ew dê biketaya . |
| Em biketana . | Em dê biketana . |
| Hon biketana . | Hon dê biketana . |
| Ew biketana . | Ew dê biketana . |

Raweya bilanî .

Boriya berdest . Ez keti biwam . Tu keti biwa .
Ew keti biwa . Em keti biwan .
Hon keti biwan . Ew keti biwan .

Dema niho/ paş .

| Forma I . | Forma II . |
|---|---|
| Ez bikevim . | Ko ez keti bim . |
| Tu bikevî . | Ko tu keti bî . |
| Ew bikeve . | Ko ew keti be . |
| Em bikevin . | Ko em keti bin . |
| Hon bikevin . | Ko hon keti bin . |
| Ew bikevin . | Ko ew keti bin . |

Forma wan ên neyînî bi ne têne çêkirin .

Raweya fermanî .

Bikeve . Bikevin . Bi kevin .
Me keve . Me kevin . Me kevin .

95 – Lêkerên hevedudanî .

Lêkerên hevedudanî du texlît in :

a – Yèn ko bi arîkariya pêşdaniyan têne çêkirin wek:

Anîn , deranîn , hilanîn , deranîn .
Bûn , rabûn , vebûn .
Dan , dadan , derdan , hildan , vedan .
Hatin , dahatin .
Avêtin , hilavêtin .
Ketin , daketin .
Kirin , rêkirin , vekirin , dakirin , hilkirin , rakirin .
Kişandin , hilkişandin .
Kuştin , vekuştin .
Şandin , reşandin , daweşandin , vereşandin .
Xwarin , vexwarin ,
Xwendin , vexwendin ,
Xistin , daxistin , derêxistin , raxistin , têxistin
Anîn , hilanîn , [illegible] ,

Herwkî me nîşeh kir pêşdanî di zmanekî de dewlemendî ye û bi wan re lêker û navine nû tên çêkirin :

Ve – vebûn , vejandin , vekirin , vekuştin , vemirandin , vereşandin , venirîn , veniştin , vexwarin , vexwendin , vedan .
Ra – rabûn , rakişandin , rakirin , raxistin , radan , rakirin .
Rê – rêkirin , rêdan .
Der – deranîn , derdan , derêxistin , derketin û h.
Da – dadan , dahatin , daketin
We – weşandin .
Hil – hilanîn hilavêtin , hilawistin , hildan ,

Hilkişandin , hilkirin , hilmaştin , hilperiştin , hilgirtin û h . d .

Kesandina lêkerên hevedudanî yên forma yekemîn mîna lêkerên sade ne ji hin derqeydeyan pê ve :

Berlêkerên di dikevin navbira pêşdanî û lêkera sade wek : Min vedikir .Ez vedikin .

Rawişa pareka neyînî ji wiha ye wek :

Min venedikir . Ez venakim .

Di forma neyîniyê de berlêkera di dikeve .

Ez dikim . Ez nakim .

Bervajî berlêkera di ya boriya berdest , di forma neyîniyê de nakeve , weke xwe dimîne wek:

Min dikir . Min nedikir . Ez diketim . Ez ne diketim û h . d .

Kesandina lêkera hevedudanî forma yekemîn :

Rêkirin .

Raweya rader : Rêkirin .

Raweya pêşker .

Boriya têdayî .

Min , Te , Wî , Wê , Me , We , Wan rêkir .

Boriya dûdar .

Min , Te , Wî , Wê , Me , We , Wan rêkiriye .

Boriya berdest .

Min , Te , Wî , Wê , Me , We , Wan rêdikir .

Boriya çîrokî .

Min , Te ,Wî , Wê , Me , We , Wan rêkiri bû .

| Dema niho . | Dema pêş . |
|---|---|
| Ez rêdikim . | Ez ê rêkim . |
| Tu rêdikî . | Tu ê rêkî . |
| Ew rêdike . | Ew ê rêke . |
| Em rêdikin . | Em ê rêkin . |
| Hon rêdikin . | Hon ê rêkin . |
| Ew rêdikin . | Ew ê rê kin . |

Raweya hekînî . Forma I û III .

Min , Te , Wî , Wê , Me , We , Wan rêkira.

Min , Te , Wî , Wê , Me , We , Wan dê rêkira .

Raweya bilanî . I û II .

Dema borî .
Min ,Te , Wî , Wê , Me , We , Wan rêkiri biwa .
Dema niho û paş .

| Forma I . | Forma II . |
|---|---|
| Ez rêkin . | Ko ez rêkiri bim . |
| Tu rêkî . | Ko tu rêkiri bî . |
| Ew rêke . | Ko ew rêkiri be . |
| Em rêkin . | Ko em rêkiri bin . |
| Hon rêkin . Ew rêkin . | Ko hon rêkiri bin . |
| Ew rêkin . | Ko ew rêkiri bin . |

Raweya fermanî . Rêke . Rêkin . Rêkin .
Rêmeke , Rêmekin . Rêmekin .

Lêkerên hevedudanî Forma diwenîn .

Lêkerên hevedudanî forma diwenîn ev lêker in ko bi arîkariya nav û rengdêrekê û lêkereke sade têne çêkirin mîna : Ava kirin . Peyda kirin . Winda kirin ; Bihnteng kirin . Aciz kirin û h. d .

Di van lêkerên hevedudanî de bitenê lêkera sade tê kesandin wek :

Min aciz kir . Te aciz kir . We aciz dikir . Hon aciz dikin . Ew ê aciz bike û h. d.

96 - Biwêjên lêkerî .

Biwêjên lêkerî ji daçek , pronav û lêkereke heve-du danî ne wek : Lê dan ango li wî an li wê dan . Lê xistin ango li wî an li wê xistin . Jê hez kirin . Lê siwar bûn . Jê peya bûn . Lê ketin .

Jê geriyan . Jê ketin . Lê pirsîn . Jê pirsîn .
Dev jê berdan . Jê girtin . Lê hatin . Jê hatin .
Pê mijûl bûn û h. d .

97 - Kom 2 . Li gora kardaniya wan .

Lêkerên sergerandî û lêkerên pêgerandî . d [illegible] ,
lêkerên pronavkî û lêkerên nekesanî .

a - Lêkerên sergerandî..

Lêkerên sergerandî herwekî ne berî jî goti bû rast bi rast û bê arîkariya daçekan têrker distînin û ji vê têrkerê re [illegible] ne , têrkera gerandî nav lê dikin wek : Min sêvek xwar . Sînemê kurê xwe dît . Temo çû gund .

b - Lêkera pê gerandî

Lêkera pêgerandî bê arîkariya daçekekê ni kare têrker bistîne wek :
Ez ji Kurdistanê têm . Heso li Hewlê rê dixe - bite . Zaro di bexçeyê de dileyizin .

C - Lêkerên pronavkî .

Pronavê lêkerên pronavkî her xwe ye , nêr û mê , gelejmar , yekejmar wek :
Min xwe şûşt . Temo xwe dikuje . Wan xwe lezand
Hon xwe bilezînin . Keçik xwe şûşt û h .d .

Ç - Lêkerên . nekesanî. .

Lêkerên nekesanî herwekî navê wan jî şanî me me dide bê kes in wek :
Raweya rader Baran barîn . Berf dahatin
Raweya pêşkerî :
Dema niho : Baran dibare . Berf datê .
Dema paş : Baran dê bibare . Berf dê bê an dabê .
Boriya têdayî : Baran barî . Berf dahat .
Boriya dûdar : Baran bariye . Berf dahatiye .

Boriya berdest : Baran dibarî . Berf dadihat .
Boriya çîrokî : Baran barî bû . Berf dahati bû .
Raweya hekînî ; Dema borî . Forma I .
Baran bibariya . Berf dahata .
Forma II . Baran dê bibariya . Berf dê dahata .
Raweya bilanî : Boriya berdest .
Baran barî biwa . Berf dahati biwa .
Dema niho û paş . Baran bibare . Berf dabê .

Kom 3 . Li gora şiklên wan : Biservehatî û ne biserve hatî ango ji qeydeyan der .

Di zmanê kudî de , bi awakî amdagirtî dikare bê gotin ko ji raderên lêkeran hemî demên borî û ji raweya fermaniyê hemî demên niho û paş dikarin bêne kesandin .

Nebiservehatiya hin lêkeran ji aliyê çêkirina raweya wan ya fermanî ye . Hin raweyên fermanî j . hene ko dəmên wan yên niho û paş bi awakî derveyî qeydeyan têne çêkirin .

98 - Rader . Berlêker . Dawîneyên lêkeran .

Dawîneyên raderan dido ne / in û n .

Heke rayê raderê bi tîpeke dengdar qediya dawîne in û heke bi tîpeke dengdêr qediya dawîne n. e.
wek : Kirin , firotin , gotin , dîtin , xwendin û h.d.
Dan , anîn , çûn , danîn û h.d.

Bêrlêker sisê ne : Di , bi , ê bi an dê bi , an wê bi
Her sê şiklên dawîn rast in .
Di . Bi kêrî çêkirina demên Boriya berdest û Niho .tê . Min dikir . Ez dikim .

Di forma neyîniyê de berlêker di ya Boriya berdest na keve lê ya dema Niho dikeve wek : min ne dikir lê Ez na kim .

Berlêker bi di çêkirina raweya fermanî , di demê raweya hekînî , dema niho û paş ya raweya bilanî bikêr tê .

Heçî berlêker ê bi di çêkirina dema paş ya raweya pêşkerî û raweya hekînî , dema paş F . II. bi kêr tê .

Bike . Bixwe . Bavêje . Bîne . Bibêje .

Here . Were . Ev du raweyên fermanî ji qeydeyan der in . Min bikira . Min bigota .

Ez ê bikim . Ez ê bixwim . Ez ê bavêjim .

Ez ê bînim . Ez ê bibêjim .

Min ê bikira . Min ê bigota . Min ê bixwara û h. d.

Heçî dawîneyên lêkeran bi awakî amdagirtî ev in :

a - Lêkerên pêgerandî û demên niho û paş yên lêkerên sergerandî : im , î e ,in , in , in .

Heke lêker bi dengdêrekê diqede :

m , - , - ; - n , n , n .

Ez dikevim . Tu dikevî . Ew dikeve . Em dikevin , Hon dikevin . Ew dikevin .

Ez dibêjim . Tu dibêjî . Ew dibêje . Em dibêjin . Hon dibêjin . Ew dibêjin .

Ez çûm . Tu çû . Ew çû . Em çûn . Hon çûn . Ew çûn .

Heçî demên borî yên/sergerandî [lêkerên] dawîneyên wan ev in :

Boriya dûdar : iye , iye , iye ,iye iye , iye , iye ye . Min kiriye . Te kiriye . Wî kiriye û h . d .

Boriya çîrokî : i , i , i , i , i , i , i ye .

Min kiri bû . Te kiri bû , Wî kiri bû , Wê kiri bû . Me kiri bû û h. d.

Demên borî yên raweya hekînî .

Dawîneyên wan ev in : a, a, a, a, a , a, a .

Min bikira . Min bigota . Wî dê bigota û h .d .

Gava lêker di şiklê neyîniyê de ne,berlêker bi , ê bi dikevin wek / Bike , me ke .Bibêje , me bêje . biçe , me çe .. ez bikim , ez ne kim û h . d .
Heke lêker bi dengdêrekê destpêdike berlêker i yên xwe davêjin . Bajo cihê biajo ; bavêje cihê biavêje . Baxêve cihê biaxêve û h. d .

Niho ko me çavên xwe li rader , berlêker û dawîneyên lêkeran gerandine,em ê qala lêkerên biservehatî û -nebiservehatî bigerînin û bi kitkitên wan mijûl bibin

99- Lêkerên biservehatî .

Lêkerên biservehatî du kom in . Di koma yekemîn de lêker bi dengdêrekê diqede û ji bona çêkirina raweya wan ye fermanî dengdêra dawîn tê hilanîn ..

| | | |
|---|---|---|
| Barîn ; | barî ; | bibare . |
| Betilîn ; | betilî ; | bibetile . |
| Bezîn ; | bezî ; | bibeze . |
| Biriqîn ; | biriqî ; | bibiriqe . |
| Birîn ; | Birî ; | bibire . |
| Kirîn ; | kirî ; | bikire . |
| | | û h . d . |

Nîşank . Bê dişwarî hate dîtin bi çiawayî raweya fermanî tê çêkirin : Barîn barî bibare .

Lêkerên biservehatî koma diwemîn

Rayên wan lêkeran bi dengdarekê diqedin . Lêkerên vê komê sê texlît in .
Şiklê yekemîn de , herwekî me gotiye tîpa dawiya lêkerê dengdarek e û dengdêra wê ya dawîn t..îpek ji bilî a ye .

| | | |
|---|---|---|
| Bihîstin ; | bihîst ; | bibihîse |
| Girtin ; | girt ; | bigire . |
| Nihêrtin ; | nihêrt ; | binihêre |

Şiklê diwemîn deli cihê dengdêra a dikeve dengdêr e û dengdara t ya dawiya rayê ..

lêkerê 

tê hilanîn . Bijartin , bijart ; bibijêre .
Parastin ; parast ; biparêse (ze) .
Spartin ; spart ; bispêre .

Şiklê sewemîn .

Di vî şiklî de , dengdêra dawîn a ye û rayê raderê bi dengdara d diqede .

Betilandin ; betiland , bibetilîne .
Ceribandin ; ceriband ; biceribîne .
Kelandin ; keland ; bikelîne .
Meyizandin ; meyizand ; bimeyizîne . û h.d.

Lêkerên nebiservehatî du texlît in .

Texlît I . Çêkirina raweya wan a fermanî ji qeydeyan der e lê gava em raweya wan a fermanî dizanin kesandina demên borî û paş li gora qeydeyên zanî ye wek :

Kirin ; kir ; bike .
Gotin ; got ; bibêje .
Avêtin ; avêt ; bavêje .
Kuştin ; kuşt ; bikuje . û h.d.

Texlît II . Ev lêker in ko ji raweya wan ya fermanî demên niho û paş , li gora qeydeyan dernakevin .

Anîn . Bîne . Ez tînim .
Herîn . Here . Ez terim an . Ez diherim .
Hatin . Vere . Ez têm. û h.d.

Nîşank . Neyîniya lêkerên karîn û zanîn ya demên niho ni ye wek : Ez ni zanim . Ez ni karim .

## HOKER

I00- **Hokerên cihkî :**

| | |
|---|---|
| Li dereke din | Ji derve |
| Di dora ...de | Dormador |
| Ji vir da | Dorhêl |
| Ji wê da | He , ha |
| Li hindurê | Ji derve |
| Di pişt ... de | Di pêş ... de |
| Li paş | Li pêş |
| Di ser ... re | Li ber |
| Di bin ... de | Di bin ... re |
| Jorîn | Jêrîn |
| Li vir , li here | Li wê |
| Dûr | Nêzîk |
| Ji dûr ve | Li her derî |
| Li kû | Tê de |

**Hokerên demkî :**

| | |
|---|---|
| Hingê | Îro |
| Demberê | Berê |
| Hema | Berî |
| Di vê nîzîkahiyê de | Her hal |
| Zûka | Qende be |
| Zûkanî | Daimen |
| Ji hingê ve | Ji vir ve |
| Dawî , talî | Paşê |
| Duhî | Tucar |
| Pêr | Eydî |
| Di cih de , hema | Car car |
| Bitirpêr | Sibe |

| | |
|---|---|
| Nagehan | Niho |
| Carina | Gava , Kengê |
| Pirîcar | Di wextê berê da |
| Bistkî | Dewrana berê |
| Hingavî | Zû |
| Nişke | Dereng |
| Hemîn | Hero |
| Hêja | |

Hokerên çiqasî :

| | |
|---|---|
| Giş , Hemî | Bes |
| Pir | Hêj |
| Pirtir , Hêj bêtir | Hîçne |
| Bêtir , pirtir | Kêmtir |
| Çend , Çende | Bi xwe |
| Heke , Ger | Ewçend |
| Eger , hinde | Hevqas |
| Hindik , kêm | Zeyde |
| Biqasî , Çiqas | Hinde |
| Çiqas , Çiqas jî | Heta ko |
| Zehf , gelek , pir | |

Hokerên awakî :

| | |
|---|---|
| Bed , Xirab | Biqasî |
| Bedtir , Xirabtir | Jî |
| Zor , Qewî | Pevre |
| Çito , Çawan | Bihevre |
| Holê , Wiha | Çima , Çire |
| Wilo , Werge | Ji ber vê yekê |
| Qesdane | Nemaze |
| Sif | Lez Zû |
| Çêtir, Zûtir, Layiqtir Xezka | Baştir, Ętir, Qenctir |

Hokerên erînî û gumanî digel biwêjên hokerî :

Bêguman . Nexwe . Tutişt . Birastî . Biewleyî . Belê . Erê . Bêşik . Heye ko . Dibe ko .

Hokerên neyînî din : Ni . No . ne . Na . Tu . Yekcar . Hîç .Qet .

[illegible] hokerên:/ Di cih de . Tişbe . Bi nîvî . Ji nişka ve . Di ser..ve . Destpêkî . Pêşîn . Hîç . Hinbihin . Dor dor . Bidijdilî . Ji nîzîkahî ve . Ji der ve . Pêr . Bitirpêr . Par . Pêrar . Hema . Yekcar . Tevlîhev . Hindik . Bê serûbin . Bêetlahî . Bi vî rengî . Bi çu rengî . Pirtir.pirtir . Demek . Hema . Geh geh . Tewr .

Nîşank . Bi arîkariya parekên bi , î , ane , ahî û h. d.

Ĩzehî hokerî têne çêkirin wek :Bilez . Bidiqet . Bişehrezayî . Biçelengî . Bidilhebînî . Şehsiwarane . Ciwan - mêrane . Birindî . Biqencî . Bisivikahî . Aqilane . Biedeb . Bieṛn . Binermî . Ehmeqane . Bidizîka . Bidelalî . Mîrane . Bihîşkî . Comerdane . Eqilmendane û h. d .

IOI - Daçek û biwêjên daçekî :

Li , ji..re , piştî , berî , bi..re , digel , ji bo ji bona , jû pê ve , jê pê ve , her çend jî , Ji xeynî , di ..re , di nav...re , li ba , li cem , li nik , der nav , dide , der , ji.. , gava , dema ko , ji..ve , paş , li paş , hema , li ber , li paş , hema , li ber , li pêş , di dema ...,de , di...de di nav beyna , tevî , bidana , bi...re , der tenişta , ta ko , heta ko , ji ber , tê re , li ba , cihê , li cihê , bibehayê , di..re , dij , dûrî , der saya , herwekî , ji derveyî , der nîzîkî , der nav , ber bi , ber bi...ve , li gora , di bin...de , li ser , di ser..re , di bin...re , eve , ewe , ji ...pê ve , jibilî , weriya , der penaha , jêrî , jorî , pêşiya , di nav ..de , der dora , ji tirsa , pêş bi , pêşberî , der drêjahiya , heta , heçî û h . d.

IO2 - Gihanek û biwêjên gihanekî :

Jî , holê , wiha , werge , wisa , ji ber ko , ango her çend jî , û , gava , wekê , lê , ji qeneve, an , her wekî , kengê , ne , ko , çendane , bi şertê ko , heta ko , bihingavî ko , me be ko , biqasî ko , herçend ko , biawyê ko , an ne, heçî , herwekî hate dîtin ko , cihê ko , hek , heke , ger , meger , bila be , herhal , mîna, nola , nolî , da ko , heta ko , ta ko , hema ko , beriya ko , ji ber vê yekê , ji dema ko , ji wextê ko , ji hingê ko , dîtkî , pêna , dervexistî , dervemayî , lewra , ji lewra , piştî ko , weriya ko , herwekî ko , wisanî ko , gava ko , dema kk , bihna ko , hinde ko , hema ko, ji ber ko , rexma , xesma û h . d .

I02 - Baneşan :

Ev in çend baneşan :
Yên hizn û kederê : Ax li min . Ax li min ezo !
Ax li min ezê . Way li min porkuê !Way li min !
Yên bankirinê : Lo ! Lo lo ! Lê ! Lê lê ! Yabo !
Ya dê . Hey lê ! Hey lo ! û h. d.
Gelî bi kêrî pirskirinê û bankirinê tê wek :
Mirovo ! Dotmamê !
Heke nav gelejmarîn e , dawiya navî parek in tê dayîn wek : Kurdino ! Pismamino ! . ' û h. d.
Gelî Kurdino ! Gelî pismamino !

I03 - Rastnivîsandin .

Rastnivîsandina zmanê me ne tiştekî dişwar e , nemaze ji bona me .
Herwekî we,di rûpelên vê kitêbê de, dîtiye ji veqetandek û ji tewangê pê ve bêje hemî cihê têne nivîsandin ango nav , pronav , rengdêr , lêker , hoker , daçek , gihanek û baneşan .

Hînker : Bextê nêr kerê jî dike nêr . Dê û dotê
şer dikir , kêmaqilan bawer dikir . Mirov
zêrê xwe di sûka ceh de na firoşe .
Mû bi mû , rihek çêdibe . Ava hêdî hêdî
me ecêb jê dî .( dît ) . Kevroşka mê û
nêr , mirovê xurt dizane . Nanê sêlê durû
ye . Wextê leglegê çû bi leqleqê .
Bila ez xwerê şêran bim , û ne nêçîra çeqel û
roviyan bim . Ji giya nermtir nî ne ,
di bin keviran de na mîne . Çiyayên bilind
bê berf na bin , newalên kûr bê av na bin .
Dest destan dişo , vedigere rûyan dişo .
Gotine rovî : " Me tu kirî mitê mirişkan . "
Rovî girî û got : " Ez ji siûda xwe ne bawer
im . Ez kurd im . Navê min Temo ye .

104 - Hevoksazî an çêkirina hevokan .

---

Heroyî ango adetî hevoka kurdî bi awayê jêrîn e :

| | | |
|---|---|---|
| Min | sêvek | Xwar . |
| Temoyî | hespek | kirî . |
| Sînemê | brayê xwe | dît . |
| Kirde. | têrker . | lêker . |

Lê hevokin hene ko di wan de têrker piştî lêkerê tê dayîn .

| | | |
|---|---|---|
| Ez | diçim | Kurdistanê . |
| Ew | hat | Hewlêrê . |
| Kirde . | Lêker . | Têrker . |

Ji aliyê din heke me bala xwe da methelokên kurdî rûpel 59. me dît ko mirov dikare texlît , texlît hevokan pêk bîne , saz bike wek :

Ez ê te bînim mal . Ez bawer dikim ko te hevalê xwe Tacîn, ji mêj ve,ne dîtiye . Min ji kurê xwe re kitêbek da . an Min kitêbek da kurê xwe .
Ez ê te bigihînim gundê xwe . Duhî êvarê gelek meyvan hati bûn mala me . Navê te çi ye ? Navê min Hevind e .

Texlîtên hevokan .

---

Hevokên biserxwe . Hevokên biserxwe ev hevok in ko manake sergihayî ango manake timam tê de ye wek : Roj ji bona hemiyan dibiriqe . Xwîn di rayên me de diherike . [illegible] Duhî êvarê brayê min , yê mezin , bi çend hevalan çû gundê braziyê me . Ez bi dîtina we gelek bextewar im . Gul çîçê keke bihindar e . Zaro ,bi qelema xwe, wezîfa xwe ya kurdî dinivîse .

Herwekî tê dîtin hevokên jorîn hevokên biserxwe ne lêkereke kesanî bitenê tê de ye .

Lê hevkin hene ko di wan de du lêkerên kesanî hene ango ji du perçehevokan hevedudanî ne wek :

Birçîtî li deriyê mirovê xebatker dinêre , bêî ko bikeve hundur . Perça hevokê ya pêşîn ev e :

Birçîtî li deriyê mirovê xebatker dinêre ,

Perça hevokê ya diwemîn : bêî ko bikare bikeve hundur .

Bihntengî nexweşiyek e , dermanê wê xebat e .

Hevoka kûre ango esasî : Bihntengî nexweşiyek e , Hevoka sergiha ango timamker : Dermanê wê xebat e .

Hevokên biserxwe yên pêşhevdanî :

Min berdîti bû , we xwe xapand . Te xirabî kir , te dê biêşînin . Bêtir wext dibore , ew bêtir bi bedbextiya xwe dihese .

Hevokên rêzkirî :

Ez hatim , min dît , min zora wan bir .

Roma ko berê hinde bi nav û deng bû û ko dinya xisti bû bin destê xwe , îro wê mezinahiya xwe ya siyasî û eskerî winda kir .

Hevokên pê ve girêdayî :

Ez bawer dikim ko ew nesax e . Wan dixwest ko em guhdariya wan bikin . Bêje min tu kî yî ?

Gava ez nexweş bûm , hon li min pirsîn . Ez eydî ni zanim li kû me ! Heyfe ko kes banî min ne kir . Ez dixwazim ko hon bextiyar bin . Ez minêkarim ko poşman ne bin . Gava ez li Kurdistanê bûm , min çiyayên bilind dîtin . Divê bifikirin ko wext li we dibore . Ji we re ye ko ez dibêjim . Ew çêtir daxêve ko dike . Ez dizanim ko hon li wê bûn .

Ez guman dikim ko ew bê . Stêr in yên ko dibiriqin .

Hacîreşk diçe , gava serma tê .

## ELFABEYA KURDÎ :

| TÎPÊN ÇAPÊ | | TÎPÊN DESTNIVÎSANDINÊ | |
|---|---|---|---|
| Gerdek | Hûrek | Girdek | Hûrek |
| A | a | A | a |
| B | b | B | b |
| C | c | C | c |
| Ç | ç | Ç | ç |
| D | d | D | d |
| E | e | E | e |
| Ê | ê | Ê | ê |
| F | f | F | f |
| G | g | G | g |
| H | h | H | h |
| I | i | I | i |
| Î | î | Î | î |
| J | j | J | j |
| K | k | K | k |
| L | l | L | l |
| M | m | M | m |
| N | n | N | n |
| O | o | O | o |
| P | p | P | p |
| Q | q | Q | q |
| R | r | R | r |
| S | s | S | s |
| Ş | ş | Ş | ş |
| T | t | T | t |
| U | u | U | u |

| TÎPÊN ÇAPÊ | | TÎPÊN DESTNIVÎSANDINÊ | |
|---|---|---|---|
| GIRDEK | HÛREK | GIRDEK | HÛREK |
| Û | û | Û | û |
| V | v | V | v |
| W | w | W | w |
| X | x | X | x |
| Y | y | Y | y |
| Z | z | Z | z |

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10

11 12 13 14 15 16 17 18 19

11 12 13 14 15 16 17 18 19

20 100 1.000 I0.000 100.000

20 100 1.000 10.000 100.000

1.000.000 I.000.000.000

1.000.000 1.000.000.000

Hûrek: HÎNKER SER TÎPAN :

a b c ç d e ê f g. h i î

a b c ç d e. ê f g. h i î

j k l m n o p q r s ş t û û

j k l m n o p q r s ş t u û

v w x y. z

v w x y z

TEYDAKER INDEX

Rûpel

Awa,n.m. = Cas ,façon
Awayê biwarî = Cas direct
Awayê nebiwarî = Cas indirect
Baneşan,n.f.11,59=Interjection
Bariyar =Péjoratif
Berhevanî,n.f.8 =Superlatif
Berlêker,n.f.51=Préverbe
Bêje,n.f. 1 = mot
Bihnok,n.f. 33 =Virgule
Biserxwe =Indépendant
Biwêja pronavkî=(locution (prononominale
Biwêjên daçekî,58(locutions (prépositives
Biwêjên gihanekî 58( locutions (conjonctives
Biwêjên hokerî(locutions (adverbiales
Biwêjên lêkerî,49(locutions (verbales
Boriya berdest an Boriya nîzik 43( Imparfait
Boriya çîrokî,43=Plus-que-parfait
Boriya Dûdar an Boriya dûrtir 43( Passé ( simple
Boriya Têdayî an Boriya dûr 43(Passé (composé
Daçek,n.f.,10,58=Préposition
Dawîne,n.f.,32,51=terminaison
Dem,n.f., =Temps
Dema borî, 44=Temps passé
Dema niho, 44=Temps présent
Dema paş,44 =Temps futur
Dengdar,N;F,,2=Consonne

Rûpel

Dengdêr,n.f.,2 = Voyelle
Dengdêra drêj,2=Voyelle longue
Dengdêra kurt,2=Voyelle courte
Devkî = Oral
Dijraber,n.f.,12=antonyme
Durawest ,34 =Deux-points
Elfabe,n.f. =Alphabet
Embaz,n.f. = Exemple
Eyleta navan,8=( famille de ( noms
Gelejmar,n.f.,15 = Pluriel
Gihanek,n.f.,10,58 =Conjonction
Girdek,n.f.,11 = Majuscule
Girêka duta =Conjonction double
Girêka yekta=Conjonction simple
Guhêrbar, 8 = Variable
Guhêrker,n.f.,5 =Affixe
Hevdeng,n.f.,12= Homonyme
Hevenav,n.m.,13= Nom commun
Hevok,n.f.,1 = Phrase
Hevoksazî,n.f., = Syntaxe
Hînker,n.f.,8 =Leçon,exercice
Hoker,n.f.,10,55= Adverbe
Hûrek,n.f.,2 = Minuscule
Ji hevkirina lêkeran , 37
Jmarnav,n.m.,15 = Nombre
Kes,n.m., 31 = Personne
Kesandin,n.f.,43 = Conjugaison
Kesandin (bikesîne) 42( Conjuguer
Kesandina lêkera kirin , 43
Kesandina lêkera ketin

Rûpel

Kesên lêkerê,30=(Les personnes (dans les verbes

Kesê Diwemîn = 2e personne

Kesê pêşîn an yekemîn = (1ère personne

Kesê sewemîn = 3e personne

Kevane,n.f.,37 = parenthèse

Kifşdarî ,29 =(complément (circonstantiel

Kirde,n.f., 27 = Sujet

Kîte,n.f., 5 = Syllabe

Lêker,n.f.,9,26,27 =Verbe

Lêkera arîkar bûn , 38

Lêkera biservehatî,51,53 = Verbe régulier

Lêkera gerakî =(Verbe à la (forme active)

Lêkera hebûnê,40=Verbe avoir

Lêkera hevedudanî ) forma diwemîn, ) 49 Aciz kirin )

Lêkera ketinê,45,46,=conjugaison du verbe tomber

Lêkera nebiservehatî, 51 (verbe irré- ( gulier

Lêkera negerokî = (verbe à la (forme passive

Lêkera nekesanî,50,54 (Verbe im - (personnel

Lêkera pêgerandî,50=Verbe intransitif

Lêkera pronavkî,50,=Verbe pronominal

Lêkera sergerandî,50,= Verbe transitif

Lêkerên biservehatî, 53

Lêkerên hevedudanî) (Verbes com- forma yek )47=(posés

Lêkerên nebiservehatî , 54

Rûpel

Nav,n.m., 9 , 43 , = Nom

Navên heve - dudanî )14=Noms composés

Navên kombêj,13=Noms collectifs

Navên nenêrbaran,14=Noms ab - strait

Navên nêrbaran,13=Noms concrets

Navên sade = Mots simples

Neguhêrbar,8,9=Invariable

Nivîskî = par écrit

Nîşandek,n.f.,33,36=Ponctuation

Nîşandeka) axaftinê) 36 = Tiret

Nîşandeka du nikan,35=Guillemet

Nîşandeka hêdanê,35=Point d'exclamation

Nîşandeka pênekan,36= Tirets

Nîşandeka pirsê,35=Point d'interrogation

Nîşank,n.f.,7 = Remarque

Parek ,n.f.,40 =Particule

Paşdanî,n.f.,5 = Suffixe

Perçehevok,n.f.,1=Préposition

Perçeyên axaftinê,8=Partie du discours

Pevdeng,n.f.,4= Diphtongue

Pevhatin,n.f. = Accord

Piçûker,n.f.,7=Diminutif

Pêşdanî,n.f., 5 = Préfixe

Pêşevanî ) bêtirker )n.f.,8=Compératif

Perçehevok,n.f. = Proposition

Pêşe,n.f. = Prose

Pêşekar,s. = Prosateur

Pêşkerên hejmarkî,16=Article indéfini

Pirkîte,n.f.5=Polysyllabe

Pirs,n.f.,4 = Mot

Pirsa sade = Mot simple

Pronav,n.m.,9,22,23,24,25,26=Pronom

Pronavê kirdewar=Pronom sujet

Pronavên Bîrdar , 25=Pronoms dédinis

Pronavên Destdaniyê,22,23=Pronoms possessifs

Pronavên hevdudîtiyê,25=Pronoms réciproques

Pronavên kesîn,22=Pronoms personnels

Pronavên kurtkirî,26=Pronoms abrégés neutres

Pronavên nebinavkirî,24,25,=Pronoms indéfinis

Pronavên yên hevedudanî,25=(Pronoms indéfinis) (neutres

Pronavê pêger an têrker (Pronom complément·

Pronavê pêhatî an girêkî ) 15,16,24 =(Pronom relatif)·

Pronavên pêşker,23=(Pronoms démonstratifs

Pronavên pirsiyarî,24=(Pronoms interrogatifs

Pronav û daçekên hevgirtî ) 26=(Pronoms et prépositions contractées

Ra ,n.m.,5= Racine

Rader,Berlêker, Dawîneyên lêkeran 51,52=(Infinitif, (préverbe, (terminaisons (des verbes

Rakişandin,n.f.=dérivation

Ranima,n.f. = Etymologie

Rastnivîsî,n.f.,59 =Orthographe

Rawe an Derawa,31= Mode

Rawest,n.f.,35= Point

Rawestên peyhev,35=Points de suspension

Raweya bilanî,31=Mode subjonctif

Raweya çêbiwar,3I=(Mode participe passé

Raweya fermanî=Mode impératif

Raweya hekînî,31=(Mode conditionnel

!Raweya parnihayî,31=(Mode participe pr"sent

Raweya pêşker,31,32=(Mode indicatif

Raweya rader,31=(Mode infinitif

Rengdêr,n.f.,10,18=adjectif

Rengdêrên çilobûn û Çawabûnê ) 18=(Adjectifs qualificatifs

Rengdêrên Destdaniyê an Xwedîtiyê ) 18=(Adjectifs possessifs

Rengdêrên Jmarda ) 20,21=(Adjectifs numéraux (cardinaux

Rengdêrên Jmarîn ) 20=(Adjectifs numéraux

Rengpêşda = Exemple

Rengdêrên Nebinavkirî ) 20=(Adjectifs indéfinis

Rengdêrên Pêşker ) 19,20=(Adjectifs démonstratifs

Rengdêrên Pirskerî ) 20=(Adjectifs interrogatifs

Rengdêrên rêzda ) 20,21=(Adjectifs numéraux cardinaux

Rêkirin-Kesandina lêkera hevdudanî-Forma yekemîn ) 48

Rêzahev an Hevmana,n.f. ) 12= Synonyme

Rêzana zmên,1 = Grammaire

Serdanî,n.f.,39= Atribut

Serdayî,n.f. = Accent
Serenav,n.m.,13=Nom propre
Spehênivîsî,n.f.=Calligraphie
Şewane,n.f. = Vers
Tewandin,n.f.,16,17=(Décli - (naison
Têrker,n.f.,18=Complément
Têrkera geran-an Geranî ) 28,29=(Com- (plément (direct
Têrkera negeran) dî an Negeranî) 29=(Complément (indirect
Tîp,n.f.,1 =(Lettre (alphabétique
Tof,n.f. = Groupe
Veqetandek,n.f.,9,15=(Particule (de genre
Veqetandeka parkî,n.f.(Article (partitif
Yekejmar,n.f.,15 = Singukier
Yekîte,n.f.,5 = Monosyllabique
Zayend,n.f., 14 = Genre
Zayenda mê,14,15=Genre féminin
Zayenda nêr,14,15=Genre masculin
Zmanê axaftinê, 1=Langue parlée
Zmanê nivîsandinê,1=(Langue (écrite

---

Kitêbên Kurdî

Di van pêncî salên dawîn de ji çar hezarî bêtir kitêbêkurdî hatine çap kirin .

Li vir em navên hinkitêbên ko bi zmên giredaniya wan hene didin zanîn .

Rêzmanên kurdî ango qeydeyên zmanê kurdî

---

Bingehên Gramêra Kurmancî :
Celadet Bedir - Xan
Şam - I94I . —

---

Eléments de Grammaire Kurde
Kamran Bedir - Xan
Parîs - I953.

---

Gramatika Zmanê Kurdî
Q . Kurdo
Erêvan - I956 .

Rêzmanê Kurmancî .
Reşîd Kurd
Şam - 1956 .

---

A Kurdish Grammar .
Ernest N . McCarus
New York - 1958 .

---

Awa û Destûra Zmanê Kurdî
Cegerxwîn .
Bagdad - 196I .

---

Rêzmanê kurdî .
Çukkerman .
Moskova - 1962 .

---

La Grammaire Kurde
Celadet Bedir - Xan
Roger Lescot .
Parîs - 1970

---

Navên çend ferheng ango qamûsên kurdî .

---

Ferhenga kurdî - frensizî .
I5 000 pirs .
A . Jaba .
Petersburg _ 1870 .

---

El Murşid .
Ferhengeke Erebî - Kurdî
20 000 pirs .
Giyû Mukriyanî .
Hewlêr - 1950 .

Navên hin ferhengên kurdî .

Ferhenga Kurdî-Farisî -Erebî
Merdûxê Kurdistanî .
Tehran - 1955 .

---

Ferhenga Rûsî - Kurdî .
30 000 pirs .
H . O . Farîzov .
Moskova - 1957 .

---

Ferhenga Piçûk .
Kurdî _ Rûsî .
C . X . Bakaev .
Moskova - 1957 .

Ferhenga Ermenî - Kurdî .
28 000 pirs .
Siyabendo - Çaçan
Erêvan - 1957 .

---

Ferhenga Kurdî - Rûsî .
34 000 pirs .
Qenatê Kurdo .
Moskova - 1960 .

---

Ferhenga Xal
40 000 pirs .
Kurdî - Kurdî .
Mihemedê Xal
Silêmanî - 1960 .

---

Ferhenga Mehabad .
30 000 pirs .
Giyû Mukriyanî .
Hewlêr , çapxana kurdistan .
196I

---

Dictionnaire Kurd ,Français Angalais
Joyce Blaû -Bruxelles -1965.

---

Ferhenga Kurdî - Ingilîzî.
Tawfiq Wahby - C.J.Edmonds .

---

KUrtçe -TUrkçe . Sözlük
Musa Anter - Istanbul -1967 .